


## Nivîskara oldar a Tirk Sabîha Unlu:
# Serxwebûn mafê Kurdan e!
▶4



## Endamê Konseya Serokatiya KCK'ê Bozan Tekin:
# Em ê çawa agirbestê dirêj bikin?
▶3


# Rûdaw
ÇAPA EWRÛPA
Xwendevanên Rûdawê bêtir dizanin




دیانا شانازی بە کوردبوونی خاڵەکانییەوە دەکات
## خوارزاکەی کوردان بە ٣ مانگ زیندان حوکم درا
9 ◀


Deutschland 1,50 Euro | Danmark 15,00 DKK | France 1,50 Euro | Nederland 1,80 Euro | Schweiz 2,70 CHF | Sverige 21,00 SEK

Hejmar / Nr. 69 2 Mijdar / November 2010 | www.rudaw.net | info@rudaw.eu




### Di zîrveya Wezîrên Derve yên welatên Ereban de
# Qeddafî serxwebûna Kurdan parast

**Serokdewletê Lîbyayê Muemer Qeddafî bi kiryarên xwe yên seyr gelek caran balê dikşîne ser xwe. Muemer Qeddafî herwiha bi helwesta xwe ya piştevan ji bo gelê Kurd jî tê naskirin. Di hevpeyvînek taybet ligel Rûdawê de, Wezîrê Derve yê Îraqê Hoşyar Zêbarî behsa zirveyek Wezîrên Derve yên welatên Erebî li Lîbyayê dike û dibeje ku Muemer Qeddafî di wê zîrveyê de li peşberî hemû wezîrên amade piştevaniya gelê Kurd kir û got ku mafê Kurdan jî yê yekbûn û serxwebûnê heye. Hoşyar Zêbarî anî ziman ku ti kes li hemberî van gotinên Qeddafî derneketiyê, tenê Wezîrê Derve yê Sûriyê, Welîd Mûalîm, bersiva Qeddafî daye û gotiye ku ew ne ligel dirustkirina dewleteke Kurdî ne.**

*Bersiva Muemer Qeddafî ya ji bo Wezîrê Derve yê Sûriyê di rûpela 11'an de bixwîn.*

## Dadgeh Cehşan efû nake!

Li Başûrê Kurdistanê, di dema Saddam Hûseyîn de, Betalyonên Parastina Nîştîmanî (grûpên cehşan) ji bo serokên bêtiriya eşîrên Kurdan û hin kesatiyên navdar ên civakê jî, hatin avakirin û ji serokên wan re digotin Misteşar (şêwirmend).

Dema di sala 1991'an li wê beşa welat serhildan çêbû, serokatiya Eniya Kurdistanî efû ji bo wan cehşan derxist. Lê roja 11'î Cotmeha 2010'an Dadgeha Bilind a Tawanên Îraqê fermana girtina 258 ji wan şêwirmend û cehşên Kurd derxist, bi mebesta beşdarîkirina wan di prosesa Enfala dijî gelê Kurd de. Serokê Rêxistina Enfalên Kurdistanê, Zeman Ebde, dibêje biryara Bereya Kurdistanî van cehşan ji dadgehê rizgar nake: "Di warê yasayî de jî ew li ber efûyê nakevin, ji ber ev mafê şexsî yê xelkê ye." ▶5




# Gotinên Ozkok lê vegerandin

**Kurdan li Essenê, bi gotinên wî yên li hemberê Ahmat Kaya, Ertugrul Ozkok şermezar kirin** ▶2

## Tîma Xencerê dîsa derket

Tîma Xencerê ku di nava Kurdan de weke tîma kontr-gerîlla tê nasîn û sala borî 2 endamên DTP'ê kuştin, niha dîsa kete rojevê. Endamên vê tîmê kincên gerîllayên PKK'ê li xwe dikin û li gundan digerin. Li gorî çavkaniyan, komeke nêzî 60 kesî ku di nava wan de îtirafkarên PKK'ê jî hene, di meha Remezanê de li çendîn gundên Herêma Garzanê geriyan û ji gundiyan pere xwastine û ew bi kuştinê tehdîd kirin. Serkêşê vê tîmê jî kesekî bi navê Koç Ustegmen e û ew niha li Şirnexê di alayê de li ser kar e. ▶4


Reklam






www.arsivakurd.org

**Serokê Yekîtiya Parlamenterên Kurdistanê, piştî hevdîtina bi Karayilan re:**

# Em ê hêlên sor ên netewî deynin

**Hewlêr (Rûdaw) -** Serokê Yekîtiya Parlamenterên Kurdistanê, Nîmet Ebdulla, ragihand ku ew ji bo nexşerêya Kongreya Netewî ya Kurd, dixwazin civînekê saz bikin û biryar e di dahatû de ev civîn bê sazkirin û got: "Ji bo vê armancê em ê ligel aliyên siyasî baxivin."

Roja 24'ê Cotmeh a 2010'an Yekîtiya Parlamenterên Kurdistanê gavên ji bo girêdana civîneke aliyên siyasî yên her çar parçeyên Kurdistanê avêt û li quntara çiyayê Qendîl serdana PKK'ê kir û ligel Serokê Koma Civakên Kurdistanê, Murat Karayilan, civiyan.



Roja 24'ê Cotmehê endamên Yekitiya Parlamenterên Kurdistanê li Qendîlê serdana Karayilan kirin

Yekîtiya Parlamenterên Kurdistanê li gor yasa 17'an a Parlamentoya Kurdistanê di sala 2007'an de li Herêma Kurdistanê hat damezrandin û niha 500 endamên wê hene, ku çend parlamenterên parçeyên din ên Kurdistanê jî endamên vê yekîtiyê ne.

### "PKK'ê soz daye me tenê parastinê bike"

Endamê gera yekem a Parlamentoya Kurdistanê û Serokê Yekîtiya Parlamenterên Kurdistanê Nîmet Ebdulla behsa serdana yekîtiyê ji bo quntara çiyayê Qendîl kir û ji bo Rûdawê diyar kir ku ji bilî mijara direjkirina agirbestê û gotûbêjkirina mijarên giştî, mebesta sereke ya serdanê amadekariya girêdana civîneke aliyên siyasî bû: "Ji bo danîna nexşe rêya Kongreya Netewî ya Kurd." Navborî amaje da ku wan ji PKK'ê re pêşniyar kirine ku piştî bi dawîbûna agirbestê dest bi şer nekin: "Ev pêşniyara me li cem wan pir girîng bû, wan soz dan ku ew ê tenê parastinê bikin."

Ev demeke li Herêma Kurdistanê behsa amadekariya kongreyeke netewî tê kirin; heta niha jî çend caran dema civîna kongreyê hatiye destnîşankirin, lê nehatiye kirin. Bi baweriya Nîmet Ebdulla ji bilî hêzên siyasî yên Kurd, plangêriya welatên derdorê jî sedemekî paşxistina vê kongreyê ye. Ev nexşerêya ku Yekîtiya Parlamenterên Kurdistanê wek Nîimet Ebdulla dibêje: "Di civînê de em hewl didin ku di nav hêzên siyasî yên Kurdistanê de baweriyekê ava bikin û astengiyên ku li ber girêdana kongrê bûne rêgir, nehêlin, herwiha em ê hêlên sor ên netewî destnîşan bikin. Mebest ji hêlên sor ew e ku her çar parçeyên Kurdistanê karekî nekin ku zererê bide parçeyeke din."

Derbarê dema civînê navborî wiha axivî: "Hê dema civînê ne diyar e, niha em serdana aliyên siyasî dikin, me serdana PKK'ê jî kir, herwiha bi rêya endamên partiyên siyasî yên ku endamên wan di Yekîtiya Parlamenteran de hene, me alî agahdar kirine ku em dixwazin ligel partiyên Rojhilatê Kurdistanê jî bicivin."

### "Hemû welatên derdorê kongreya netewî ya Kurd naxwazin"

Ebdulla red dike ku serdana wan ji bo Qendîlê li ser daxwaza hikûmeta herêmê yan Tirkiyê yan aliyekî siyasî hatibe kirin: "Em rêxistineke serbixwe ne û bi gotina aliyekî kar nakin, lê me wek erkê xwe yê netewî dît vî karî bikin." Derheqê beşdarîkirina PKKê jî di civînê de, navbirî ragehand: "Erê nûnerê PKK'ê jî wê di vê civînê de beşdar bibe, lê ne şerte kesên ku tevî civînê bibin, di asteke bilind de bin û dibe di astê têkiliyan de jî bin. Herdem axaftina wan a duyem civandina kongrê ye, xuyaye mebesta wan heye, hemahengiyeke Kurdî bo meseleya bakûr bo piştîvaniya xwe û dû re jî meseleya neteweyî peyde bikin."

Her çiqasî hê sedemên paşxistina kongreya netewî nehatine ragihandin, lê Nîmet Ebdulla diyar dike ti yek ji welatên ku Kurd lê dijîn ne ligel girêdayîna vê kongrê ne. Herwiha Konsulê Îranê li Hewlêrê Seyid Ezîm Husênî di hevdîtineke berê de ligel Rûdawê got, ew li benda girêdayîna vê kongrê ne û di heman demê de jî hişyarî da û got: "Berpirsên Herêma Kurdistanê soz dane me xaka Kurdistanê dijî Îranê neyê bikaranîn, loma ger kesek bixwaze li Kurdistanê dijî Îranê tevbigere, me gotiye ew ji çarçoveya cîrantiyê derdikeve."

Derbarê axaftina ligel konsolgerên welatên derdorê li Herêma Kurdistanê li ser girêdayîna vê kongreyê, Ebdulla ragihand: "Pir caran tu dixwazî li ser mijarekê biaxivî, lê hinek kes dixwazin kontrol bikin û dibêjin ew karê serokatiyê yan jî filan partiyê ye ku li ser vê mijarê biaxive, lê ev meseleyeke netewî ye û divê hemû alî li ser biaxivin. Di dahatû de em ê serdana konsolxaneyan jî bikin û mebesta kongreyê ji wan re ron bikin û ji wan re dibêjin mebesta me ne ew e welatên dewrûberê ji me bitirsin, lê em wek neteweyekê dixwazin hundirê mala xwe sererast bikin."

**Rûdaw**
**Rojnameyeke siyasî û heftane**

**Xwedî**
Rudaw Media GmbH

**Serokê Civata Rêvebir**
Nûredîn Weysî
nuradinwaisi@rudaw.net

**Sernûser**
Ako Mihemed
akopress74@yahoo.com

**Rêvebirê Nivîsînê**
Nasredîn Akyol
nasredin@rudaw.eu

**Redaksiyon**
Firat Kelehkî
kelehkî@yahoo.com

Mehmet Sebatli
sebatli@hotmail.com

Besam Mistefa
wardoz@gmail.com

Sîdar Bengîn Epozdemir
sidar@rudaw.nl

**Dîzayner**
Hamdullah Yumlu

**Îdare û belavkirin**
Mustefa Sefîq Edilbî
gare2005@hotmail.de

**Şêwirmendê yasayî û aborî**
Dipl. Kfm. Abdulletif Canimana
info@canimana.de

**Navnîşan**
Rudaw Media GmbH
Gutenbergstr. 63a
50823 Köln/Germany

Telefon: +49 (0) 221-26 00 40 02
Telefax: +49 (0) 221-26 00 49 81
www.rudaw.net
info@rudaw.eu

Rûdaw bo nivîsên ku bi nav tên weşandin ne berpirsyar e.
© Hemû maf parastî ne

# Kurdên Essenê manşeta Hurriyetê anîn bîra Ozkok

## Di Fûara Pirtûkan a Ruhr de komek Kurd bi dovîzên 'Way şerefsiz', Ertugrul Ozkok protesto kirin

**Essen (Rûdaw) –** Nivîskarê rojnameya Tirk Hurriyetê Ertugrul Ozkok û Rêvebirê weşana rojnameya Alman Bild Kai Diekmann, di çarçova Fuara Pirtûkan a Essenê de hatin cem hev. Herdu rojnemavan li ser têkiliyên Tirkiye û Almanyayê li avahiyên Zanîngeha Essenê di semînerekê de axivîn. Di semînerê de komek ji bo Ahmet Kaya, Ozkok şermezar kirin û dovizên wek 'Way şerefsiz" rakirin.



Ertugrul Ozkok (çepê) di semînerê de ligel Kai Diekmann (rastê)

Beriya 11 salan hunermendê Kurd Ahmet Kaya, di şahiyeke li Stenbolê de got, "Ez ê stranek kurdî bêjim û jê re klîbek çêkim. Kesên ku vî klîbê biweşînin hene. Eger neweşînin ez ê li serê wan xim û wisa bidim weşandin." Piştî vî axaftinê gelek tişt hatin serê wî; gelek hunermendên Tirk di wê şevê de li dijî Kaya derketibûn û xwestibûn wî lînç bikin. Ertugrul Ozkok jî wê demê berspirsiyarê weşana rojnameya Hurriyetê bû. Ozkok, li dijî Kaya gelek nûçeyên tewanbar diweşand û carek jî di manşeta Hurriyetê de wiha nivîsand: "Way şerefsiz" ango, "wey bê şeref!" Ev helwesta Ozkok di nava Kurdan û civaka kesên demokrat de bûbû sedemê gelek nerazibûnan. Gelek kes wê demê Hurriyetê protesto kirin û rexne li Ozkok girtin.




Ertugrul Ozkok û Kai Diekmann dawiya hefta borî li bajarê Almanya Essenê tevlî semînerek bûn û di derheqê rewşa Tirkiyê û Almanya û têkiliyên herdu dewletan de axivîn. Di semînerê de komek ket hundir û ji bo Ahmet Kaya, Ertuğrul Ozkok protesto kir. Koma ji çend kesan pêk dihat di salonê de dovîzên "Way şerefsiz" bilind kirin û Ozkok şermezar kirin. Di pankartêkî din de jî wiha hatibû nivîsandin: "Heta dawiya emrê te kîjan Kurd te bibîne wê tuyê te bike." Piştî deh deqeyên bi dirûşmeyan çalakvan ji salonê derketin.

www.arsivakurd.org

Endamê Konseya Serokayetiya KCK'ê, Bozan Tekin:

# Piştî 8 agirbestên yekalî, bila kes daxwaza agirbest û danîna çekan li me neke!

Li navçeya çiyayê Qendîl, li Başûrê Kurdistanê, ku ev zêdeyî 50 salan e ji bo tevgera Kurd û dewletên ku Kurdistan bindest kirine, bûye nav û navnîşaneke diyar, Endamê Konseya Serokatiya Koma Civakên Kurdistanê (KCK), Bozan Tekin, behsa guherînên herî dawî kir.



**Bîografî**

**Bozan Tekin:**

- Sala 1962'an li bajarê Rihayê, li Bakurê Kurdistanê, ji dayik bûye.
- Di 1978'an de têkilî ligel rêxistinên PKK'ê danî.
- Sala 1980'yî ji aliyê Dewleta Tirk hatiye girtin û 20 salan li girtîgehê maye.
- Piştî demeke kurt ji azadkirin wî berê xwe dide çiyan.

**Rûdaw: Dema dirêjkirina agirbestê xilas bû, operasyonên Artêşa Tirk li Bakurê Kurdistanê berfireh bûn. Hûn ê dest bi êrîşên çekdarî bikin an agirbestê dirêj bikin?**

**Bozan Tekin:** Niha em vê mijarê gotûbêj dikin, heta niha me ti biryar nedaye. Lê em ê çawa agirbesta yekalî dirêj bikin, di dema ku Dewleta Tirk pêngavek tenê jî ne avêtiye ku nêta xwe ya paqij ji bo aştî û çareserkirina pirsgirêka Kurd li Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê nîşan bide? Heta niha Tirkiye operasyonan dike û gelê me binpê dike û li dijî me planan datîne. Vê dawiyê serok Apo ragehand eger heta dawiya Cotmehê ti pêngaveke aştiyane ji aliyê Tirkiyê neyê avêtin û guh nede daxwazên Kurdan, ez ê xwe vekişînim û wê demê çi dibe bila bibe. Tirkiyê agirbesta me ya 8'an jî wek ên din bê wate kir, me dixwest agirbesteke bê sînor, heta hilbijartinên sala dahatû, îlan bikin lê di vê demê de her tişt ji me re zelal bû û me zanî ku nêta Hikûmeta Tirkiyê ne baş e. Loma me heta mehekê dirêj kir, wek testekê, ka gelo hikûmet di propaganda xwe de rast e û wê pêngavan bavêje, lê dîsa tiştekî nekir û plan ji bo jinavbirina me datîne û ligel Îran, Îraq, Sûriyê, Amerîka, Ewrûpa û hêzên Başûrê Kurdistanê civiya, ji bo ku me ji nav bibin. Mixabin Tirkiyê hê dirûşma 'yek ziman, yek welat, yek netewe' bikar tîne. [...] Yekem agirbest di sala 1993'an de ji aliyê serok Apo hat ragihandin.

> **"Sala 1997'an me ligel hikûmeta Erbakan gotûbêj kir lê hê zû ew rakirin"**

Wê demê hinek kesan dixwestin pirsgirêka Kurd çareser bibe, wek Serokkomar Turgut Ozal, General Eşref Bitlis û wezîr Adnan Kahvecî. Lê hersê jî hatin kuştin. Pişt re nêzîka 4 hezar gundên Kurdan hatin valakirin û 4 milyon Kurdan koçî derveyî welat kirin û 17 hezar mirov jî hatin kuştin. Sala 1997'an, dema Necmedîn Erbakan bû serokwezîr, xwest pirsgirêka Kurd çareser bike, loma diyalog di navbera me û Hikûmetê de çêbû lê ev hewldan hat pûçkirin, dema dawî li hikûmeta Erbakan anîn. Ev bûyer jî di dîroka Tirkiyê de wek Derbeya 28'ê Sibatê tê naskirin. [...] Agirbesta me ya dawî di meha Remezanê de hat îlankirin, hem ji ber rojîgirtina welatiyan û hatina cejnê û hem ji bo referendûmê me got bila di atmosfereke aram de birêvebiçe, lê Artêşa Tirk rojekê berî cejnê êrîş kir û 9 gerîllayên me şehîd kirin. Gava Tirkiyê gerîllayekî me şehîd dike, dibêje me terorîstek kuşt, dema leşkerekî wan jî tê kuştin, dibêje kî agirbest? [...] Bi giştî ji 13'ê Tebaxê heta niha nêzîka 80 operasyonên bejî dijî gerîllayan hatine kirin, 90 êrîşên bi top hatine kirin ser cihên ku guman hebû gerîlla li wir bin û di encama van operasyon û topbaranan de 30 gerîlla şehîd bûn. [...] Em ê çawa agirbesta yekalî dirêj bikin di dema ku Dewleta Tirk pêngavekê jî navêje ku nêta xwe ya paqij ji bo aştî û çareserkirina pirsgirêka Kurd li Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê pêşan bide?

## Yekitiya bi zorê bila bibe yekitiya bi dil

**Ji bo berdewamiya aramkirina rewşê li Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê û ji bo afirandina atmosfêra çareseriya aştiyane wê hewldanên we çi bin?**

Em niha di sedsala 21'an de dijîn, armanc û xebata me ji bo çareseriyeke herdemî ya pirsgirêka Kurd li Bakurê Kurdistanê ye. Niha xelk hişyar bûne û dizanin kî aştiyê dixwaze û kî şer dike. Îro taqeta mirovan nemaye ku guhdariya sloganên derewîn û sozên ku nayên bicîhkirin, bikin. Gel jî gihiştiye wê baweriyê ku hikûmet ti mafekî ji bo Kurdan rewa nabîne, wekî din jî xebata demokratîk ji bo bidestveanîna armancan didomîne. Ji ber çi Tirkiyê ne wek Kanada, Fransa û Îngilîstanê be ku çendîn netewe bi azadî û bê tundûtûjî li wan bi hev re dijîn. Îro dehên mînakên bi vî rengî li cîhanê hene. Ji ber çi Tirk rê nadin li Tirkiyê ji xeynî Tirkan mafê neteweyeke din nebe, bêje ez jî heme? Divê ev yekîtiya ku Dewleta Tirk bi zorê ava kiriye bibe yekîtiyeke ji dil. Eger Tirkiye dixwaze welatekî demokratîk be, divê mafê neteweyên jêr desthilata wê û nemaze gelê Kurd bi wekhevî bide. Me daxwaza avakirina dewletê nekiriye, lê me xwestiye bi sîstema otonomî ya demokratîk bijîn.

> **"Nêçîrvan Barzanî rewş fam kiriye û nerîna wî guncav e"**

**Hûn çawa berê xwe didin daxuyaniyên Cîgirê Serokê PDK'ê Nêçîrvan Barzanî ku di Kovara Gulan de got, ji bo çareseriya pirsgirêka Kurd li Tirkiyê rêya baş û nêzîk ew e ku Tirkiye danûstandinên rasterast ligel PKK'ê bike, ji ber bi paşguhxistina PKK'ê ev pirs nayê çareserkirin?**

Ev nerîn û vedîtineke rast û guncav e, ji ber wî rewş fam kiriye, yê ku ji bo çareseriyê hewl dide em in. [...] Birêz Nêçîrvan Barzanî ev rastî gotiye ku herdu aliyên ku şer dikin, dikarin bi rêya gotûbêj û civînan şer bidin alîyekî û aştiyê dirust bikin.

**Di vê navberê de di medya Tirkiyê de behsa wê yekê dihat kirin ku li Ewrûpa civîn di navbera PKK'ê û dezgehên îstîxbaratî û siyasî yên Tirkiyê de hebûn, ev rast e?**

Na, ne rast e û heta niha ti civîneke bi vî rengî nehatiye kirin.

**Mam Celal di hevpeyvîneke ligel kanala TRT a erebî de got, min du gotar nivîsandin û şandin ji PKK'ê re û min peyamek ji bo Abdullah Ocalan jî li Îmraliyê şand ku serdemê şerê gerîlla qediyaye û êdî dem hatiye PKK çekan deyne, lê PKK derfeta karê siyasî nade. Rast e hûn rêyên karê siyasî venakin?**

Her kesê di vî warî de biaxife bila biaxife, lê Mam Celal ne di nav de, ji ber Mam Celal ji sala 1993'an ve di nav rewşê de dijî û haya wî ji hertiştî heye û baş dizane kî aştiyê dixwaze û kî şer dike. Ji ber çi van axaftinan dike? Lazim e ev pirs ji Mam Celal bê kirin. Mam Celal her demekê devê xwe vedike û çi tê ser zimanê wî dibêje. Bila ti kes daxwaza danîna çekan û agirbestê ji me neke. Piştî 8 agirbestên yekalî yên me êdî bila ti kes daxwaz ji PKK'ê û serokatiya me neke çekan deynin, an agirbesteke wiha bê wîjdanî ye. Niha bi dehan siyasetvanên me li zindanê ne û mafê wan tune bi zimanê kurdî biaxifin. Êdî çawa daxwaz ji me û gerîlla dikin ku çekan deynin. Kesên li Tirkiyê siyasetê dikin ji aliyê dewletê hatine girtin, vêca divê helwêsta hikûmetê derheqê me û gerîllayan de çawa be. Mam Celal rast nabêje, rastî di dîrokê de hatiye tomarkirin û her kes, Mam Celal jî, baş vê rastiyê dizane.

**Hûn bi çi awayî amade ne çekan deyinin?**

Heta Tirkiye operasyonên siyasî û leşkerî ranewestîne, li vîna gelê me mikur neyê, serok Apo ji zindanê azad neke, di destûra Tirkiyê de mafên gelê Kurd neçespîne, rêketineke Dewleta Tirk ligel neteweya Kurd nebe, em dest ji çekan bernadin û şoreşa xwe dijî vê polîtîkayê didomînin. [...]

**We ragihand ku Wezîrê Karêhundir ê Tirkiyê Beşîr Atalay bi rayedarên welatên cîran re kar li ser wêya dike ku navçeyeke tampon li ser sînorên Tirkiyê ligel welatên derdorê ava bike. Gelo hûn dikarin vê plana Tirkiyê hilweşînin?**

Erê, tiştekî wiha heye. Tirkiye dixwaze bi vî awayî serhildanên wek ên Colemêrg û Şirnexê û cihên din li navçeyên Bakurê Kurdistanê asteng bike û sînorekî ji acizî û serhildana gelê me re deyne. Herwiha dixwaze bi rêya avakirina tiştekî wiha li ser sînor, siyaseta xwe li ser Başûrê Kurdistanê jî zêdetir bike û xwe ferz bike. Ew dixwazin ji bo berjewendiyên xwe guherînekê li ser sînoran bikin û cihên ku gerîlla li wan e, têxin hundirê sînorê Tirkiyê. Lê ev qet wê bisernekeve.

## Di belgeyên Wikileaks de PKK jî derbas dibe

**Li gor belgeyên Amerîkî ku di malpera Wikileaks de hatin weşandin, hêzên Amerîka bi awayekî nerm ligel grubeke we li Felûce tevgeriyan û ji ber vê yekê di çend nivîsarên xwe de hûn wek 'şervanên azadiyê' binav kirin. Niha Tirkiye li ser vê yekê rexneyan li Hikûmeta Amerîka digre. Hûn çawa vêya dinirxînin, hûn hest dikin ku li ba îdareya Amerîka derheqê we de hevsoziyek hebe?**

Haya min ji van belgeyan nîne, lê ev rastiyeke û îspat dike ku em şervanên azadiyê ne û ti kes nikare vê rastiyê bide alîkî. Divê Amerîka bi vî awayî berê xwe bide me û dev ji wan nerînên şaş ku PKK'ê wek grubeke terorîst didan naskirin, berde. Ji ber gelê Kurd bi vêya dilxweş nabe. Eger tiştekî wiha hebe, ew dibe cihê kêfxweşiya me û gelê me. Em dilxweş dibin ku Amerîka şaşîtiyeke xwe rast dike. Her çiqasî em bi gotina wan bûn terorîst û ne bi gotina hinek kesan jî bûne şervanên azadiyê, em şervanên azadiya gelê xwe ne.

*Tevaya hevpeyvînê:*
***Di www.rudaw.net de bixwînê.***

***Hevpeyvîn:***
***Mehdî Mihemed Rewandizî***

www.arsivakurd.org

# Tîma Xencerê li Sêrtê li ser kar e



**Sêrt (Rûdaw) -** Tîma Xencerê ku salek berê bi kuştina 2 DTP'iyan kete rojevê, niha jî cilên gerîllayên PKK'ê li xwe dikin, li gundên Misircê û navenda Sêrtê û gundên Herêma Garzanê digerin û gefan li gundiyan dikin. Li gor agahiyan, serkêşê vê tîmê albayeke bi navê Koç Ustegmen e û ew niha li Şirnexê di alayê de li ser kar e.

Rûdawê derbarê "Tîma Xencerê" ku di nava Kurdan de weke tîma kontr-gerîlla tê nasîn, dikarî agahiyên giring bi dest bixe. Li gorî çavkaniyên ku ji ber ewlekariya jiyanê navên xwe nedan, komeke nêzî 60 kesî ku di nava wan de îtirafkarên PKK'ê jî hene, li gundên Misircêya Sêrtê, gundên navenda Sêrtê û gundên navçeyên Herêma Garzanê digerin û ji gundiyan pere dixwazin. Heman tîm gundiyan bi kuştinê tehdîd dike.

Li gor agahiyan di meha Remezanê de û meha beriya wê, ji vê tîmê 11 kes cilên gerîllayên PKK'ê li xwe kirin û çûn gundê Başûraya bi ser Misircê û gundê Pirtaya bi ser Sêrtê. Tîma ku xwe weke gerîllayên PKK'ê dan nasîn, xwestin biçin mala melayê gundê Pirtayê, lê melayê gund derî ji vê tîmê re venekir û di navbera tîmê û melayan de guftûgo derket. Endamên Tîma Xencerê ji mele pere xwestin û ew bi kuştinê tehdît kirin, lê meleyê gund guh neda tîmê û pere neda. Heman tîm piştre derbasî gundê Başûra, ya li kêleka Çemê Başûra ya bi ser Misircê bû û ji welatparêzekî Kurd pere û alîkarî xwest, lê gundiyê ku ji tîmê kete gumanan, daxwaza tîmê bi cih neanî.

### Li gund kamera danîn

Gundiyên gundê Başûra li hev civiyan û li hin malên gund kamera bi cih kirin. Piştî demekê endamên Tîma Xencerê careke din hatin gund û di navbera wan û gundiyan de dîsa gurtûgo derket. Li ser vê gurtûgoyê, di navbera gundiyan û tîmê de şerê çekdarî derket. Di şerê ku gelek gule hatin teqandin de mirî û birîndar çênebûn. Tîma Xencerê piştî vê pevçûnê neçar man gund biterikînin. Li gorî agahiyên ku rojnameya me bi dest xist, ji 11 kesên ku hatin gundê Başûra û tevlî pevçûnê bûn, 4 kes di kamerayên li gund de hatin qeydkirin. Gundiyan kasetên kamerayan teslîmê Dozgeriya Komarê ya Sêrtê kir. Piştî lêkolînan derkete holê ku yek ji van kesên di tîmê de îtirafkarekî PKK'ê ye, lê navê wî îtirafkarî nehate eşkerekirin.

### Serkêşê tîmê Koç Ustegmen e

Li gor agahiyên ku rojnameya me ji cerdevanekî ku nexwest navê xwe bide girt, Tîma Xencerê ji îtirafkar û cerdevanan pêk tê û serkêşê vê tîmê jî kesekî bi navê Koç Ustegmen e. Cerdevanê ku ji Rûdawê re axivî, diyar kir ku Koç Ustegmen berê li Sêrtê peywirdar bûye û ev leşkerê Tirk niha jî li Şirnexê weke albay kar dike.

### Tîmê 2 DTP'î kuştibûn

Di meha Tîrmeha 2009'an de li Elkêya (Beytuşebap) Şirnexê termên 2 endamên DTP'ê yên bi navê Necman Olmez (35) û Ferhad Edîş (35) li nava eraziyê hate dîtin. Piştî lêkolînên derbarê bûyerê de, DTP'iyan îdia kiribû ku endamên wan ji aliyê Tîma Xencerê ve hatine kuştin û armanca Tîma Xencerê çêkirina provokasyonan e.

## Grûpek Ereb gefan li berpirsên PDK'ê dixwe

**Kerkûk (Rûdaw) -** Piştî ku polîsê Kerkûkê 5 jinên destbiserkirî yên ser bi rêxistina El-Qaîde li Kerkûkê li hember azadkirina du keçên Kurd ên Kakeyî serbest berdan, roja 30'î Cotmeha 2010'an grûpekî çekdarî ya Ereb li Kerkûkê daxuyaniyek weşandin ku tije ye ji gefên li dijî berpirsên ewlekarî yên PDK'ê li Kerkûkê.

Di daxuyaniyê de ku bi navê "Mucahid û Ereb Kerkûk" hatiye weşandin, gef li berpirsên ewlekarî hatiye xwarin ku niha pê de wê bersiva hemû tevgerek wan bidin. Çavkaniyek ewlekarî li Kerkûkê derbarê vê gefxwarinê got: "Gefa mezin rastî General Serhed û dezgeha ewlehiya PDK'ê li Kerkûkê ye."

Cîgirê Taya 3 a PDK'ê li Kerkûkê Mihemed Xurşîd, ev gefên li dijî PDK'ê û berpirsên wê yên ewlekarî tiştekî nû nabîne "Terorîst aciz in ji ber ku dizanin PDK pêdagir e li ser pirsên netewî li Kerkûkê. Kadroyên PDK'ê yên li di nav hêzên ewlekarî de kar dikin, gelek aktîvin û derbayên mezin li terorîstan xistine."

Mihemed Xurşîd herwiha bal kişand ser hewlên nû yên Serokê Herêma Kurdistan û PDK'ê Mesûd Barzanî derbarê komkirina aliyên nakok ên Îraqê li Hewlêrê "Ji ber van sedeman ew ji me aciz in û gefa encamdana kiriyarên terorîstî li Hewlêrê dikin, lê ew tenê gotinên bê wate û vale ne."



Nivîskara oldar a Tirk Sabîha Unlu:

# Serxwebûn mafê Kurdan e!

**Unlu dibêje ku Tirkiye wiha dixuye ku ji Kurdan hez dike û Kurdan weke bira bi nav dike, lê di pişt de ew li Kurdan dixe.**

Nivîskar û lêkolînera Tirk Sabîha Unlu ku bi salan e ji bo mafê laçikê têdikoşe, diyar kir ku bi qasî Tirkên Uygurê û Çeçenan mafê Kurdan jî heye ku serbixwebûnê bixwazin. Nivîskar û lêkolînera îslamparêz Sabîha Unlu ku tim çarşev li xwe dike û ji kovara Selamê re dinivîse, derbarê pirsgirêka Kurd û mafên Kurdan de, ji Rûdawê re axivî.

**Rûdaw: Hin derdor di wê bawerê de ne ku Îslamiyet li hemberî Kurdan weke afyonê tê bikaranîn. Hûn jî di vê baweriyê de ne?**

**Sabîha Unlu:** Li Tirkiyê Serokatiya Karê Diyanetê jî bi vê mebestê hatiye avakirin. Ji bo ku dewlet hemû kirinên xwe yên xerab bide erêkirin û ji van kirinên xwe re rewatiyeke olî ava bike, ev sazî damezrand. Îro hemû kes li Tirkiyê dikare bêje "ez Misilman im", di vî warî de toleransek heye, lê yên ku dibêjin "ez Kurd im", xilasiya wan tune, ji ber vê yekê Kurd ji hemû derdoran zêdetir êş û elem dikişînin.

**Hûn pirsgirêka Kurd çawa bi nav dikin?**

Li gor derdorekî li vî welatî pirsgirêka Kurd tune ye, hebûna Kurdan bi xwe pirsgirêk e, ji ber vê yekê jî dixwazin Kurdan ji holê rakin. Ev êriş ji aliyê pergalê ve tê kirin û li hemberî van êrişan ji Tirkan ti deng dernakeve. Kesên ku li hemberî van êrîşan nikarin li ber xwe bidin, dest ji nasnameya xwe ya Kurdbûnê ku ji aliyê Xwedê Teala ve hatiye dayîn, berdidin. Yanî rêya asîmîlasyonê hildibijêrin. lê aliyekî din jî digel hemû zilm û zordariyê nasname, çand û hebûna xwe diparêze û têdikoşe.

**Li hemû welatên Îslamê Kurd bindest in. Gelo ew dewlet ne Misilman in an Misilmanî rê dide van êrîşan?**

Ew dewlet ji bo ku zilmê bi hêsanî bikin, ji zilma xwe re rewatiyek bibînin, îslamiyetê bi kar tînin. Li Sûriyê wisa ye, li Îraqê û Tirkiyê jî wisa ye. Ti dewletek weke Tirkiyê xedar û zalim nîn e. Tirkiye weke ku ji Kurdan hez dike dixuye, Kurdan weke bira bi nav dike, lê di pişt Kurdan de, li Kurdan dixe. Tirkên ku li hemberî zordariya li ser Kurdan bêdeng in jî di nava zilmê de ne. Li gor ayetê, ne tenê yên ku zilm dikin, yên ku li hemberî zilmê bêdeng in jî zilimkar in, ji ber ku bêdengbûn qebûlkirin e.

**Ji bo ku pirsgirêka Kurd çareser bibe, divê gavên çawa bêne avêtin?**

Berî her tiştî divê perwerdeya zikmakî bê qebûlkirin. Perwerdeya bi kurdî hem mafekî însanî û hem jî mafekî îslamî ye. Divê ji dibistana seretayî, heta zanîngehê û heta asta herî bilind hemû xwendin bi kurdî be.

**Xweseriya Demokratîk çawa dibînî?**

Ku Kurd vê daxwazê bikin, dewlet mecbûr e vê daxwazê qebûl bike. Çima ji bo Çeçenîstanê, Tirkên Uyguran û Tirkistanê serxwebûn û azadî tê xwestin, çima ji bo Kurdan nayê xwestin?

**Hûn piştgirî didin daxwaza serxwebûna Kurdan?**

Hûn evqas zilim li Kurdan bikin, Kurd jî wê bixwazin ji we veqetin. Ev tiştekî xwezayî ye. Ez ti caran qebûl nakim ku mafê bazariyê ji destê Kurdan bê standin. Kurd dikarin xweserî jî, federasyon jî serxwebûn jî û jiyaneke bi hev re jî hilbijêrin. Ev mafê wan e. Ger Kurd veqetînê bixwazin, wê çaxê divê dewlet vê pirsgirêkê di xwe de bibîne. Gelo we çi aniye serê Kurdan ku Kurd naxwazin bi we re bijîn? Divê bersiva vê pirsê bê dîtin û li gorî vê yekê gav bêne avêtin.

*Hevpevîn: Bawer Çem*

Rûdaw dosiyê eşkere dike

# Fermana girtina 258 şêwirmendên Kurd derket

**Salih Qadir- Ferman Çomanî**
Hewlêr / Raniya

Rojnameya El-Sewre ya organa Partiya Baas a Îraqê di hejmara 6536'an de a roja 17'ê Nîsan a 1988'an de navê 77 şêwirmendan weşandiye: "ev lîsteya fermandar û şêwirmendên betalyonên parastina nîştîmanî ye ku di prosesa Enfalan de beşdarî kirine." Lîste bi navê Letîf Ehmed Zêbarî destpêdike û bi navê Kemal Mihemed Mam Soranî bidawî dibe. Serokê Rêxistina Enfalên Kurdistanê, Zeman Ebde, dibêje ji aliyê Dadgeha Bilinda Tawanan a Îraqê biryara girtina wan kesan derketiye û wê bên xwestin ji bo lêkolînê: "yên ku tawan nekirine bila biçin dadgehê û bêtawaniya xwe îspat bikin."

Helbet piştî serhildana buhara 1991'ê serokatiya siyasî ya Eniya Kurdistanî biryara lêborînê ji bo tevahiya Cehş, Mefrezeyên Taybet (Cehşên Girêdayî Îstixbaratê) û Şêwirmendan (Serokên Cehşan bi vî navî dihatin nasîn) derxist, lê hinek ji wan li Kurdistanê neman û çûn hembêza Partiya Baas, piştî hilweşîna rêjîma Seddam berê xwe dan Kurdistanê û beşek ji wan çûn derveyî Îraqê. Zeman Ebde red dike ku biryara Bereya Kurdistanî van cehşan ji dadgehê rizgar bike: "di warê yasayî de ev lêborîn wan lixwe nagire, ji ber ev mafê şexsî yê xelkê ye. Li gor raporên xwediyên qurbaniyan û îfadeyên ku hatine wergirtin, piraniya wan behsa tawanên cehşan dikin."

Di dosiya dadgeha Enfal-1 de, behsa ti cehşekî nehat kirin, Zeman Ebde dibêje: "ev tiştekî baş bû, ji bo bikarin qirkirina Kurdan bicih bikin, ji ber ku yek ji bingehên danasîna cînosaydê ewe ku gelek bi destê gelekî din hatibe qirkirin. Ger li dadgehê behsa cehşan bihata kirin, tawana Ereban radibû û diviyabû dadgeh bi tawanên tawanbarên Kurd mijûl bibûya."

Yek ji kesên ku bi beşdarîkirina di kîmyabarankirina Helebce de



Di êrişên Enfalan de ji bilî leşkerê rijêma Seddam, bi sedan batalyonên cehşan jî beşdarî tê de kirin

hatibû tometbarkirin, Komîserê Firokevan, Tariq Remezan, bû. Tariq li sala 2007'an li Kerkûkê hatibû girtin û li cem asayişa giştî li Silêmaniyê girtî bû û bi biryareke siyasî hat azadkirin. Ew Firokevan ê Ereb ji aliyê Dadgeha Bilinda Tawanan a Îraqê li Bexda hatibû xwestin, lê asayişê ragihand ku ew ji destê wan reviyaye, dû re firokevan bi xwe belav kir ku ew bi awayekî normal hatiye azadkirin.

### Di demeke kurt de dadgeha Enfal 2 buroyên xwe li Kurdistanê vedike

Derbarê dema destpêkirina dosiya Enfal 2 li Dadgeha Bilinda Tawanan a Îraqê, Zeman Ebde got: "di demeke kurt de dosiye destpê dike. Dadwerên Dadgeha Bilinda Tawanan a Îraqê niha li Kurdistanê ne û wê di demeke nêzîk de li buroyan vekin û her kesê ku gilînameyên wî hebin dikare serdana van ofîsan bike." Derbarê negirtina cehşên Kurd ku navên wan di lîsta Dadgeha Bilinda Tawanan a Îraqê de hatine, Zeman Ebde diyar kir: "beşeke wan ketine nav partiyan de, nemaze PDK û YNKê û hinekan jî post wergirtine, hinekên din bi têkiliyên xwe wiha kirine ku parastina wan bê kirin. Sedemê ku ev mesele nehatiye cîbicîkirin siyasî û civakî ne." Hinek ji van serok cehşan bi awayekî eşkere dibêjin em bi gotina filan serkirdeyê Kurdistanê tevdigerin, lê Zeman Ebde wê yekê red dike.

Bi baweriya Ebde, hewandina cehşan: "pir metirsîdar e û niha dadgeha bilinda tawanan li jêr xetera girtinê de ye. Ez bi xwe ligel dozgerên vê dadgehê axivîme ka ji ber çi dest bi dosiya Enfal 2 nakin. Ew dibêjin em her Ereban digrin û dadgeh dikin, lê tawanbarên Kurd ji xwe re li Kurdistanê digerin." Zeman Ebde dibêje ku tevahiya belgename, gilîname û şahidên dosya Enfal 2 amade ne û çaverê dikin dadgehkirina bê destpêkirin, tenê pirsgirêkeke girtina van cehşên li derve heye "hinekan navên xwe guherandine û bi navekî din çûne derve û mafê mayînê wergirtine. Helbet wê bên dîtin, lê dem jê re divê."

### Dadgeha bilind daxwaza girtina tometbaran dike

Berdevkê Dadgeha Bilinda Tawanan a Îraqê, Mihemed Ebdulsahîb, ragihand ku: "karê dadgehê derxistina fermana girtina tometbarane û me ev kir. Girtina tometbaran karê desthilata cîbicîkirinê de ye çi li Herêma Kurdistanê yan li hikûmeta navendî, kêmasî ji wane." Mihemed Ebdulsahîb dibêje: "her dema ev tometbar bên girtin, emê di demeke kurt de wan dadgeh bikin."

Hefteya borî rûniştevanên nahiya Sengeser dijî herdu kevnemisteşaran Ebas Bayiz Axa û Brahîm Axa xwepêşandanek saz kirin û ragihandin ku destê wan di Enfalkirina gelê Kurd de heye û divê bên dadgehkirin. Lê li gor kurê Ebas Bayiz Balo Axa, Kameran destek li pişt vê mijarê heye û hinek kes, ku wan wek nehezên xwe tometbar dike, xelkê navçeyê dijî wan dehif didin.Ebas Bayiz ku di serdema şoreşa Îlonê de pêşmerge bû û di salên 80'an de fewcek ji bo rêjîmê damezrand, dû re tevî vê hêzê di serdema rêjîmê de çû Îranê. Kameran Ebas Bayiz got: "ew nikarin xwe nêzîkî me bikin, lê her kesê belgeyên wî li ser bavê min û Brahîm Axa hebin ku destê wan di Enfal a gundên Kurdistanê de hebû, xwîna me lê helal be."

Li gor agahiyên dest Rûdawê ketine, Dadgeha Bilinda Tawanan a Îraqê li Bexda, daxwaz dike ku kesên bi beşdarîkirina di Enfala 1 de tên tometbarkirin, bên girtin û bişînin Bexda ji bo lêkolîn ligel wan bê kirin û bên dadgehkirin.

## Biryarên dadgeha Enfalan

Piştî ku Dadgeha Bilind a Tawanên Îraqê di beşê yekem ê dadgehkirinê de li ser Enfal-1, Enfal weke cînosayd a dijî gelê Kurd nasand û biryara darvekirina Elî Kîmyayî, Sultan Haşim, Husên Reşîd Tekrîtî da û Sabir Ebdulezîz Dûrî û Ferhan Mutleg Cebûr jî bi zindana heta hetayê mehkum kir, wê dadgehê di 24'î Hezîran a 2007'an de biryar da pêrabûnên yasayî derheqê 423 daxwazkiriyan de bên girtin, ku navên piraniya wan di dema birêveçûna dadgeha Enfal-1 de li ser zarên şahid û gilîkaran hatiye, yan jî navê wan di belgenameyên dadgehê de, hebûn. Lîsteya dadgehê bi navê şêwirmendê reviyayî yê Serokkomarê Îraqê, Mam Celal, Wefîq Samerayî destpêdike û bi navê Mihemed Seîd Ehmed Harûnî bidawî dibe.

Dadgeha Bilind a Tawanên Îraqê bi nivîsareke fermî ku roja 11'î Cotmeh a 2010'an derket û ji Serokayetiya Herêma Kurdistanê, Serokayetiya Hikûmeta Herêma Kurdistanê, Wezareta Navxwe û Wezareta Karûbarên Şehîd û Enfalkiriyên Herêma Kurdistanê re hat şandin; fermana desteserkirina 258 şêwirmend û fermandarên mefreze û cehşên serdemê Baasê derxist ku bi beşdarîkirinê di prosesa Enfala dijî gelê Kurd de, tometbar in.

---

**Hemîd Muxtarî**

Kurdên Rojhilatê Kurdistanê koç dikin

# 40 milyon Îranî hejar in

Li gor Navenda Serjimêriya Îranê, rêjeya bêkariyê li wî welatî ji sedî 14.6 e, herwiha hejmara bêkaran di buhara îsal de 3 milyon û 518 hezar kes bû.

Endamê Buroya Siyasî ya Komeleya Şoreşgêrên Zehmetkêşên Kurdistana Îranê, Ebûbekir Muderisî, di hevpeyvîneke ligel Rûdawê dibêje: "rêjeya bêkariyê li Îranê gelek ji serjimêriya ragihandî zêdetir e."

Ajansa Mêhr di raporekê de rêjeya bêkarên temen 15-40 saliyê ji sedî 25 radighîne û dibêje "ji sedî 60'ê xelkê Îranê ciwan in, wate nêzîkî 42 milyon kes li Îranê li navbera temenê 15-40 saliyê ne, ger %25 ji xelkê Îranê bêkar bin, nêzîkî 10 milyon kes li Îranê bêkar in." Çalakvanê Siyasî, Mihemedsalih Qadirî, sedema jordeçûna rêjeya bêkarî li Îranê vedigerîne ser nebûna siyaset û plana vejandina aborî û berdewam zêdebûna nifûsa Îranê.

Li gor axaftinên Serokê Navenda Serjimêriya Îranê, Adil Azer, 30 milyon kes li jêr hêla hejariya rêjeyî ne. Bi egera kêmbûna projeyên xizmetkirin û kargehên pîşesazî li bajarên Rojhilatê Kurdistanê, salane hezaran ciwanên Kurd ji bo bidestxistina kar rû li bajaraên mezin ên Îranê dikin. Li gor rêzbendiyê Parêzgehên Rojhilatê Kurdistanê kêmtirîn kargeh lê hene.

Serokê Şêwra bajarê Bîcar, Behmen Kazimî, dibêje: "hejmara rûniştvanên vî bajarî kêm dibe." Ebûbekir Muderisî sedema vê yekê vedigerîne ji bo ferq û cudahiyên siyasî, çandî û aborî ku li Îranê hene.

Digel zêdebûna bêkariyê, kirîzên din jî ber bi zêdebûnê ne wek tiryakiyê û nexweşiyên saykolojî, jinberdan, xwekujî û xwefiroşî. Li gor lêkolîneke Navenda Mîs ku derbarê Îranê encam daye derketiye ku ji sedî 60'ê xwekujiyan pêwendî bi pirsa bêkarî heye, herwiha gorî lêkolîna han salane zêdeyî 200 hezar kesên pispor û xwendekar Îranê bi cî dihêlin.

Berpirsê Rêxistina Navenda Dijberîkirin digel Tiryakiyê li Kurdistanê, Ebdulezîz Muslûdî, ji Rûdawê re got "niha zêdeyî 4 milyon kesan li Îranê bûne tiryakî û madeyên bêhoşker li bajarên Kurdistanê gelek bi hêsanî û bi nirxek erzan tên bidestxistin."

Bi sedma dorpêçên aborî li ser Îranê gelek kompaniyên biyanî naçin wir, Mihemedsalih Qadirî texmîn dike ku dorpêç tundtir û zêdetir bin: "ji sedî 90'ê aboriya Îranê ji dest Sipaha Pasdaran e, ev grûp jî di nava lîsteya grûpên terorîstî de ye, lewra nikare digel ti kompaniyeke din girêbestên bazirganî hebe, eva jî bandor xistiye ser jiyana xelkê."

www.arsivakurd.org

# 10 pirtûk nivîsandine, lê hîn jî şofêrê taksiyê ye

Ew şofêrtiyê ji xwe re wek biçûkatiyê nabîne lê dibêje ku rewşa wî neynika trajediya nivîskarên Kurd e.

**Dilbixwîn Dara**

Cankurd, yan jî weke ku di nava xelkê de bi navê Bavê Dara tê naskirin, nivîskarekî Kurd e, bi kurdî û erebî dinivisîne. Di nivîsandinê de jî gelekî berhemdar e. Li aliyekî ji zimanê erebî, îngilîzî û almanî nivîsan werdigerîne kurdî, li aliyekî çîrokan kom dike û dinivisîne, li aliyekî helbestan dinivisîne, şanoyan dinivisîne, lêkolînan çêdike… Nasekine. Li aliyê din jî ji bo ku debara mala xwe bike weke şofêrê taksiyê kar dike.

Hinek caran bi roj kar dike, hinek caran jî bi roj dinivisîne, bi şev kar dike. Lê gelek caran ew nivîsên xwe di taksiya kar de, di dema tunebûna rêwiyan de dinivisîne. Em li kafeteryayekê hev dibînin. Hez dikim li êşa nivîskarekî Kurd ku 10 pirtûk çap kirine, 4 bi erebî, 6 bi kurdî, 4 pirtûk jî li benda weşanxaneyekê ne ku xwedî li wan derkeve, guhdar bikim, ku niha weke şofêrê taksiyê kar dike.

Cankurd li Rojavayê Kurdistanê, li herêma Efrînê, di sala 1948'an de ji dayîk bûye, ev 31 sal in li Almanya dijî. Berî 31 salan ew hatibû bajarê Bonnê, ji wê demê heta îro her li wî bajarî ye. Wî siyaset û nivîskarî bi hev re dest pê kir, di navbera salên 1970-1977'an de gelek caran ji aliyê hêzên ewlekariya Sûrî ve hatibû girtin, gelekî jî îşkence û azarî dîtibû. Dibêje: "Ez 8 zindanên Suriyê ji hundir ve nas dikim, li bajarên Heleb, Şam û Humusê. Ji ber ku ez endamê Partî bûm, ez gelekî hatime êşandin…"

Li ser destpêka nivîskariya xwe Cankurd wiha dom dike: "Sala 1968'an pirtûkeke alfabeya Osman Sebrî kete destê min, min xwe fêrî kurdî kir û nivîsand, min berê bi erebî dinivîsand. Piştî ku fêrî alfabaya kurdî bûm min dest pê kir, bi kurdî binivisînim…"

Ev 42 sal in bênavber Cankurd dinivisîne, 42 sal in ranewestiya ye û nafikire ku raweste jî. Nivîsa wî ya yekemîn di 60'an de di kovara Gulistan de hatibû weşandin, wê demê ew kovar ji aliyê şaîrê Kurd Cegerxwîn ve dihate derxistin. Dibêje: "Heta ku destê min bilive, çavên min jî bibînin ez ê binivisînim. Nivîsandin bûye perçeyek ji jiyana min…" Cankurd dibêje nivîskarî ji wî re weke wezîfeyekê ye, ew weke wezîfeyeke însanî jî dibîne.

Nivîskarê Kurd Bavê Dara diyar dike ku nivîskariyê li kêleka dostan neyar jî ji wî re peyda kirin. Nivîskarî û gotarên wî yên siyasî ew mehkûm kiriye. Nikare vegere welatê xwe. 31 sal in li xerîbiyê, dûrî welatê xwe dijî. Pir hez dike berî mirina xwe vegere, carek be jî, welat bibîne, lê belê nikare.

Wî siyaset û nivîskarî bi hev re, heta demekê birêve biriye, lê ew bi nivîskarî sekinî. Ew niha xwe nivîskar dibîne. Siyasetê ew gelekî êşandiye. Dibêje: "Siyasetê her kes êşandiye, weke nimûne Osman Sebrî bi xwe partî çêkiribû, ji partiya xwe hate avêtin. Rehmetî Mistefa Barzanî jî, ku di dîrokê de semboleke welatperweriyê ye ji bo Kurdan, siyasetê ew jî êşand… Nikarim ji siyasetê bi dûrkevim, her çiqas ez êşandibim jî, lê dîsa dixwazim weke nivîskar werim naskirin…"

Ew hem nivîskar e, hem jî şofêrê taksiyê ye, hem jî wergêre dike. Dikare dema xwe baş bi rêk û pêk di navbera nivîskarî û şofêrtiya taksiyê û karên din de parve bike. Dibêje: "Li Almanya rewş wiha ye, mixabin. Ji ber ku nivîskarî nikare min xwedî bike, ez mecbûr im kar bikim. Bi şofêrtiya taksiyê û bi tercumaniyê debara mala xwe dikim…" Cankurd şofêrtiya taksiyê ji xwe re weke biçûkiyekê nabîne, lê belê dibêje ku rewşa wî neynika trajediya nivîskarên Kurd e, ku tê de dijîn.


Cankurd ev 31 sal in li xerîbiyê dijî

# Eger navdar bibe, wê îlûstrasyonên Kawa çêke

Ev xortê Kurd bi fîrmeyên Alman û Amerîkî re dixebite û li gor senaryoyan ji wan re îlûstrasyonan çêdike. Dilê wî heye ku lehengê Kurd Kawayê Hesinker jî têxe nava wêjeya nûjen.


Sedat Ozgen

**Mehmet Sebatli**

Sedat Ozgen (26) xortekî Kurdê Êzîdî ye ku dema du salî bû tevî malbata xwe hatiye Almanya. Li bajarê Munsterê zanîngeh xwendiye û ji beşa Grafik-Designer dîploma wergirtiye. Niha Ozgen bi fîrmeyekî Alman û yeka Amerîkî re kar dike û li ser daxwazên van fîrmeyan îlûstrasyonan amade dike. Ew dibeje, eger rojekê baş bê naskirîn, ew ê xêzeromana Kawayê Hesinkar amade bike.

Her diçe derfetên danasîna çanda Kurd a klasîk bi alavên nûjen zêde dibe. Îlustrasyon, ango vegotina mijareke bi wêneyan, yek ji van derfetên nûjen e. Bi derfetên dizayn û komputerê mirovek tenê bi serê xwe dikare îlûstrasyonên kesayetên dîrokî çêke û dikare anîmasyonên wan jî, ango wêneyên tevger jî amade bike. Sedat Ozgen yek ji van kesan e û di vê beşê de li Zanîngeha Munsterê di navbera salên 2004-2008'an de perwerde dîtiye. Di dema xwendekariya xwe de Ozgen li ser daxwaza mamosteyên xwe jiyana Kurdên ku koçî Almanya kirine, bi teknîka îlûstrasyonê vegotiye û mamoste gelek ecibandiye. Di dema zanîngehê xwe de Ozgen herwiha li Frankfurtê di dibistaneke taybet de ku şagirtan ji bo karê îlûstrasyonê perwerde dikir, ders daye.



Ozgen beriya ku li bajarê Almanya Kolnê di fîrmeyeke Alman de dest bi kar bike, bi fîrmeyeke Amerîkî re xebitiye. Derbarê vî karî de Ozgen dibeje, "Fîrmeya Amerîkî ya bi navê Moonstone ji min daxwaza îlûstrasyonan dikir. Wan ji min re senaryo rêdikirin, min jî li gor senaryoyê wêneyê karakteran çêdikir. Bi taybetî wêneyên karakterê bi navê Phantom. Ev wêne bêtir komîk bûn, ango mijarên bi kenî." Ozgen paşê li Kolnê di fîrmeya Prototyp de dest bi heman karî dike, lê têkiliyên xwe bi fîrmeya Amerîkî re jî didomîne. Niha di fîrmeya Alman de li ser lîstik û anîmasyonên di Facebookê de kar dike.

Ozgen di sala 2008'an de li ser jiyan, çand, leheng û şerên Kurdan bi armanca pirtûkek amade bike, îlûstrasyonan çêdike. Piştî ku xêz zêde dibin û dikare wek pirtûkek çap bike, serî li weşanxanxaneyeke Alman dide. Lê mixabin wê demê çend turîstên Alman li Çiyayê Agirî ji aliyê gerîlla ve hatibûn girtin. Ozgen derbarê serpêhatiya xwe ya bi birêvebirên weşanxaneya Alman de wiha diaxife: "Karê min gelek kêfa wan anî. Gelek ecibandin, lê rasterast negotin em çap nakin, gotinê anîn ser mijara turîstan, gotin ku niha tiştek wiha nekin baştir e." Ev serpêhatî ji bo Ozgen dibe wek nimûne ku derfet bibîne û karê xwe bi serê xwe bike.

### "Ez ê Kawayê Hesinkar bikim lehengekî nûjen"

Di nava îlûstrasyonên Ozgen de Kurdên ji dîrokê, tevî cilên xwe yên wê demê, tevî hesp, şûr û mertalên xwe, şal, egal û kefiyên xwe; zarok, dayîk û gundên Kurdan xuya dikin. Herwiha wêneyên ji şer, têkiliyên cîrantî, malbatî û hwd… Yek ji van Kurdên dîrokî jî Şêx Mîrzayê Êzîdî ye ku di sedsala 18'an de li Beşîriyê jiyaye. Şêx Mîrza jî wek Derwêşê Evdî têkiliyên wî bi civaka Êzîdî û ya Misilman re hebû. Ev xêz ji bo pirtûkek têr dikin û dema ku Ozgen bixwaze dikare çap bike.

Xeyala Ozgen jî heye ku rojekî di karê xwe de bibe wek otorîteyeke navdar da ku xêzên wî û pirtûkên wî di nava civakê de belav bibin: "Ez ê wê demê hewl bidim xwe ku serpêhatiya Kawayê Hesinger di pirtûkeke îlustrat de amade bikim. Ji ber ku Kawa ji bo hemû Kurdan ji her çar perçeyên Kurdistanê û hemû Kurdên ji her çand û baweriyê, nîşaneke girîng e. Ez ê wî wek Phantom, lê ne komîk, bikim lehengekî cidî û nûjen."

www.arsivakurd.org

## Li Rûsya alaya Kurdistanê hat bilind kirin



*Xoşewî Mihemed (Rûsya) -* *Roja 20'ê Cotmeha 2010'an li bajarê Tula yê Rûsyayê, Zanîngeha Tula ya Navnetewî merasîmeke fereh ji bo 80 saliya damezrandina xwe sazkir.*

*Di merasîmê de hejmareke zêde ya mêvan, nûnerên balyozxane, qonsolxaneyên welatan û herwiha Balyozê Îraqê li Rûsya, Fayiq Nêrweyî, û hejmareke zêde ya mamoste û xwendekarên zanîngehên Rûsyayê jî beşdar bûn.*

*Hêjayî gotinê ye ku xwendekarên Kurdistanê jî bi çendîn çalakiyên cuda tevlî merasîmê bûn û paşî li pêşberî kanalên navdarên medyayê alayê Kurdistanê li kêleka alayên welatên din li ser sahneyê bilindkirin.*

Çûkên Îsmail dixwazin vegerin Kurdistanê

# Kenariyên Îsmail li Danîmarka 1'em in

Îsmail dixwaze kenariyên saxlem bîne welat, ew hizra wê yekê jî dike ku grûpa Kenariyên Kurdistanê ava bike û xelkê fêrî perwerdekirina kenariyan bike.



Îsmail du salan li pey hev xelata yekem a Danîmarka stand

**Newzad Mehmûd** Silêmanî

Li kolana teng a Sabûnkeran berî 29 salan Îsmail du çûkên kenarî bi 30 Dînarên Îraqî (çapa Swîsra) kirîn, lê niha çûkên wî li pêşangehên Denmarka du xelatên yekem standin û dixwazin vegerin Kurdistanê: "ez dixwazim karekî bikim ku Ereb û Ewrûpiyên tên Kurdistanê kenariyan bikirin."

Ji bo cara yekem Îsmail di 15 saliya xwe de hezkirina kenariyan ket dilê wî, dema kenariyên Şêx Umerê Çayçî dibîne ku rojane li çayxanê dixwînin û dilîzin: "min got kak Şêx ez jî cotek kenariyan dixwazim, tuyê bi çiqasî bifiroşî min, wî got bi 30 Dînaran." Îsmail pênc mehan li benda mezinbûna çûçikan dimîne ku jiyana Îsmail guherandin.

### Çêkirina rikehan û danîna Kenariyan di odeya xewê de

Îsmail Umer Salih (44), dibêje: "min dest bi çêkirina rikeh û kirina kenariyên din kir. Min ew li odeya xewê danîn ji bo ku çavên min li wan be û dengê wan ê xweş bibihîzim." Ew biryar dide jiyana xwe ji bo vî teyrikê xweşik û dengxweş terxan bike û bi rêya Îranê çendîn kenariyan tîne malê.

Du sal ên ku ji ximzeta leşkerî ya rêjîmê reviyabû, derfeteke baş bû ku Îsmail bikare li mala xwe rikehan çê bike û bifiroşe û kenariyên xwe baştir perwerde bike: "min rikeh dirust dikirin û difirotin xwendekarên Musil û Hewlêrê, wan jî dibirin bi buhayeke zêdetir difirotin û xerciyên xwendina xwe ji wan peyde dikirin."

Pêkanîna jiyana hevjîniyê xewna Îsmail têk neda: "hevjîna min ku zanî zêde kêfa min ji xwedîkirina kenariyan re tê bû alîkareke min a dilsoz." Niha hevjîna Îsmail rojane 2-3 demjimêran bi hûrbînî xwarinê dide 130 çûçikên kenariyan û hest bi bêzariyê jî nake: "hinek ji dayikên wan tembel in û zû xwarinê nadin çûçikên xwe, loma divê em bi xwe baştir wan têr bikin."

Sala 1998'an Îsmail ligel hevjîn û zarokên xwe ji Silêmaniyê bar dike: "li Sûriyê û Lubnanê demekê man, lê dîsan jî me nedikarî bêyî kenarî bijîn, herdem bi perwerdekirina wan ve mijûl dibûn heta em gihiştin Denmarka."

Li bajarê Essburg ê Danîmarka, Îsmail mijûlî perwerdekirina kenariyan dibe û du salan pey hev xelata yekem a pêşangeha kenariyên Danîmarka bidestve tîne û di dema wergirtina xelatan de jî, sedan Danîmarkî bi çepikên xwe yên germ hezkirina xwe pêşkêş dikir: "Kenariyeke min bû xweşiktirîn kenariyên Danîmarka."

Îsmail Umer endamê grûpa kenariyên Danîmarka ye, ku 700 endamên wê hene û berî 42 salan hatiye dirustkirin, salane li bajarê Selkeburkê Danîmarka pêşangeha kenariyan bi beşdariya hejmareke zêde ya welatên Ewrûpî vedike. Ji Rojhilata Navîn tenê Îsmailê Kurd û kesekî Filistînî endamên vê grûpê ne. Ji bilî xelata yekem, Îsmail çendîn xelatên din bidestxistine.

### Dixwaze Kurdistanê bike yekemîn welatê Rojhilata Navîn ji bo kenariyan

Niha kenariyên Îsmail ku hejmara wan zêdeyî 200 e, dixwazin vegerin Kurdistanê: "dixwazim Hikûmeta Herêma Kurdistanê alîkariya min bike ji bo ku pêşangeheke kenariyan vekim û êdî xelk li Kurdistanê pêşangeha kenariyan bibîne." Îsmail dixwaze zêdeyî 200 qefesên standar ên Ewrûpî dirust bike û di vê pêşangehê de Kurdistanê bike yekemîn welatê Rojhilata Navîn ji bo kenariyan: "lê pêwîstiya min bi alîkariya darayî heye."

Îsmail Umer bawer dike ku seqaya Kurdistanê li kenariyan tê, ger hevkariya min bê kirin dikarim ciyê xwedîkirin û perwerdekirina kenariyan li Kurdistanê vekim, wê demê hikûmeta herêmê qazanceke baş dike: "ji ber her kesê ji welatên derdorê bê û kenarî bikire divê bacê bide hikûmetê." Lê Îsmail ji ber ev demeke dirêje dûrî welate, ne piştrast e berpirsên Kurd heta ku giringiyê didin karê wî: "Kenarî paqijtirîn û xweşiktirîn teyrikê cîhanê ye."

Di hundirê van rojên kêm de ku Îsmail vegeriyaye Silêmaniyê, sedan ciwan dîtine ku wek wî hezkerên kenariyane, loma wiha lê kir hizra dirustkirina grûpa kenariyên Kurdistanê bikeve hişê wî: "bêyî alîkarî ez nikarim tiştekî bikim û divê bi destên betal vegerim Danîmarka." Kenariyên Îsmail jî dikarin wek bazirgan, sermayedar û şirketên avakirinê tevî pêşxistina tecrubeya desthilata Kurd bibin û bi rêya teyrikên balkêş, deriyekî din ê welatê xwe bi rûyê cîhanê de veke: "sedan Ewrûpî hene, siyasetê nakin, lê dostên jîngeh û teyrikan in û bi pêşanegehên kenariyan xwe ji me nêzîk dikin." Vegera kenariyên Îsmail bi astê çandî û dostaniya xwezayê ya berpirsên herêmê ve girêdayî ye. Îsmail ger vegere wê ji bo hemû kesên ku dixwazin kenariyan xwedî bikin, bibe alîkarek: "ezê wan fêr bikim çawa kenariyan perwerde bikin û bi çi awayî ligel wan tevbigerin."

Îsmail sedan kenarî li Hewlêr û Silêmaniyê dîtine ku li bazaran tên firotin: "lê ew ne kenariyên paqij û tendirust in, ji ber ji welatên din tên nexweş in, ez dixwazim kenariyên paqij bînim."



# Mêvanê xwîngiran

**Taman Şakir**

Ev demeke dirêj e mirov li vê cîhanê li welatekî aram dijîn, bi hezaran kîlometro ji bo vê yekê derbas kirine. Piştî şerê cîhanî yê dûyem koça berbi Ewrûpa destpê kir û hê didome. Koçber ji tirsa mirinê direvin, yan ji hejariyê berê xwe didin Amerîka û Ewrûpa.

Di hundirê 20 salên borî de, rêjeya herî zêde ya koçberan berê xwe dan Ewrûpa. Ewrûpiyan perên zêde ji bo dabînkirina jiyana van penaberan terxan kirin, bi taybetî li welatên sosyalîst. Yekîtiya Ewrûpa (YE) jî bernama xweguncandin û têkeliyê da meşandin ji bo ku ev biyanî bikarin xwe ligel çanda van welatan biguncînin û tevî jiyana siyasî û civakî bibin, lê bernama hikûmetê tişteke û rastiya jiyana xelkê tiştekî dine. Sartre dibêje kesê heta temenê 18 salan li kîjan civakê mezin bûbe, milkê wê civakê ye û nikare bi hêsanî kevneşopiyên xwe biguhere. Loma biyanî ligel gelek sîstemên jiyana Ewrûpiyan nagucin, ev jî xeletiya çanda cuda ye, wek sîstema kar û jiyanê û awayê reftarkirina ligel zarok û malbatê.

A ji vir pevçûna şaristaniyan peyde dibe. Li Almanya ku çendîn sal lê jiyame, rêjeya herî zêde ya bêkaran di nav biyaniyan de ye. Kurdên me jî pişka şêr werdigrin, piraniya wan ji ber alîkariya sosyal rûniştine û jiyaneke Kurdewarî dijîn. Li gor hinekan jî, perên van Filleyan ji bo Misilmanan helal in û kar nakin, li ser bacên karkeran dijîn, gelek ji wan jî tên Kurdistanê jî lê hê perên sosyal werdigrin û wek mafê xwe dibînin. Ev reftarên han biyaniyên din jî rûreş kirine û bawerî di navbera hikûmetên Ewrûpî û biyaniyan de nemaye.

Her çiqasî pêwîstiya Almanan bi hêza kar heye, ji ber civak kale û hizra wê yekê jî dikin ku karkerên Ewrûpaya rojhilat bînin, lê ne karkerên gelên ku kêfa wan ji perên sosyalê re tên.

Ewrûpa ji aliyekî rastî qirîza aborî hatiye û ji aliyekî din jî mijara ewlekariya netewî li cem wan pir giringe. Gelek şanên razayî yên Rêxistina Al-Qaîde li welatên Ewrûpa dijîn û alîkariya darayî kom dikin. Vêya jî Ewrûpî hêrs kirine û li gor wan Misilman zarokên ser nuxumandî çê dikin. Di warê civakî de jî heta niha çendîn tawanên kuştinê li ser namûsê di nav netewên Rojhilata Navîn de qewimîne, loma li gor min ne ecêbe Şêwirmenda Almanya, Angela Merkel, behsa şikestina guncandinê 'integrasiyon'ê li Almanya dike, ji ber ev penaber zêde dikevin li ser rewşa aborî, siyasî û civakî ya Almanya. Min hinek kes naskirine rojekê jî kar nekirine û hinek rojan li du sê pizîşkan geriyane û sedan fen û fût kirine ji bo ku kar nekin, bi hinceta ku nexweşin. Hin kes jî heneku piştî 15 salan jî fêrî ziman nebûne. Helbet bi sedan mînakên din jî hene û eger ez behsa wan bikim wê romanek jê derkeve, loma dibêjim ger mirov mêvan jî be baştire mêvanekî can sivik û kêm mesref be. Nêzîk dibînim ku ji niha şûnde kesên biyanî bişînin welatên wan, an wan neçar bikin bi xwe vegerin.

www.arsivakurd.org

## Li Rewandizê 10 pez bûn qurbana “Berîvanê”



***Rewandiz (Rûdaw)** – Fîlmê Tirk ê bi navê Berîvanê ku bi kurdî hatiye doblajkirin û heftê du caran di Kanal 4 de tê weşandin, bû sedema xeniqîna 10 pezên gundekî ser bi Qezaya Rewandizê. Çend şev berî li gundê Kerek a Qezaya Rewandizê, du şivan beriya destpêkirina fîlmê Berîvanê, reva pez li çiya bi tenê dihêlin û tên gund ku fîlm temaşe bikin. Lê piştî fîlm bidawî dibe şivan vedigerin çiya û dibînin gur êrîş kiriye ser pez û hinek ji wan kuştine. Çavkaniyê got di 40 deqîqeyan de 10 pez bûne qurbanê Birîvanê.*

## “Bila Nêçîrvan Barzanî ji bo festîvala fîlmên Kurd derfetên xwe bi kar bîne”



### Derhênerê xwediyê pir xelat, Bahman Qubadî:

# Divê Kurd ji bo xwe fîlman çêkin

Qubadî amadekariya fîlmek nû dike ku tê de lîstikvanên surprîz hene. Derhênerê navdar sînemaya Kurd a niha ‘bê bav’ bi nav dike û dibêje: “Divê festîvala filmên Kurd bê lidarxistin. Li Başûr ji bo kişandina fîlman pere heye, lê sîstem tune.”

Temaşevanên sînemaya cîhanê bi Yilmaz Guney û Bahman Qubadî, sînemaya Kurd naskirin. Îro Qubadî di sînemaya Kurd de derhenêrek herî serkeftî û zîrek e. Qubadî bi salan e zilm û perçebûna gelê xwe tîne ser perdeya spî. Ji ber wî jî rastî xedexe û êrîşên Dewleta Îranê bûye û nikare vegere cîhe jê dayîk bûye. Niha ji bo filmek nû dîsa derdikeve pêşiya temaşevanên sînemayê…

Derhenêrê Kurd ê xwediyê gelek xelatan Bahman Qubadî, îsal serokê juriya 47. Fîlm Festîvala Antalyayê bû. Qubadî heta niha di gelek festîvalên fîlm de xelatan wergirt. lê îcar wî biryara xelatan da û belav kir. Qubadî ev yek wek serkeftina sînemaya Kurd dibîne, lê li aliyê din rewşa sînemaya Kurd jî ne baş dibîne û dibejê, “Divê ev rewşa xirab bê guhertin.” Gelo wê çawa pêşkeve? Qubadî wiha bersiva pirsa me dike: “Li Başûrê Kurdîstanê divê sazîyên sînemayê bên avakirin û ev kar bi zanistî bê meşandin. Wê gavê sînemaya Kurd bi ser dikeve.” Qubadî bi rêya Rûdawê bang li Nêçîrvan Barzanî jî dike û dibêje bila ew ji bo lidarxistina festîvala fîlmên Kurd alîkarî bike. Em bi Qubadî re li ser pêşketina sînemaya Kurd, rewşa wê ya li Herêma Kurdîstanê û fîlmê wî yê nû axivîn…

**Projeya fîlmê we yê nû kengê destpêdike û mijara film çî ye?**

Ez texmin dikim film wê 3 an jî 4 mehê din despê bike. Mijar jî wek fîlmên min ê din çîrokek ji jîyana Kurdan e.

**Çawa?**

Çîroka zilamek Kurd e. Jiyana wî ye. Ev jî perçeyek ji jîyana Kurdan e.

**Film wê li kû bê kişandin?**

Film, li Bakurê Kurdistanê, li bajarê Wanê û li Herêma Kurdîstanê derbas dibe..

**Navê film çî yê?**

Biborîne, ji ber hin pirsgirêkan ez naxwazim îro bêjim. Gava me dest bi kişandinê kir ez ê wê gavê diyar bikim.

**Di çapemeniyê de nûçeyek hat weşandin; tê gotin ku hûn ê di filmê xwe de rolek bidin Beren Saat. Ev nûçe rast e yan na?**

Na na, tiştek wisa tune. Ew nûçeyek derew e. Lê ez dixwazim teklîfek wisa ji Beren Saat re bikim. Lê vî gavê ne zelal e.

**Wê kîjan lîstikvan di film de bilîzin?**

Qet tişt ne dîyer e. Ji ber wê ez nikarim nav bidim. Ez îro hinek nava bidim û sîbê nebin, dibe derew. Ji ber wê em çi bêjin jî vala ye. Lê ez dikarim viya bêjim; di film de hinek lîstîkvanên navdar yên Yunan, Îranî û Tirk hene.

**Hûn niha li Hewlêrê dijîn. Rewşa we ya li wir li gor Îranê baş e yan na?**

Bê guman di navbera Herêma Kurdîstanê û Îranê de ferqek mezin heye. Di serî de li vir tehlîka jîyanê tune. Mirov li vir dikare her tiştî bike. Li Îranê her tişt qedexe ye; muzîk, çêkirina fîlman û gelek tiştên din. Mirov nikare Îranê û cîhek din muqayeseyî hev bike. Lê li vir hinek tengasiyên jîyanê û pirsgirekên çêkirina fîlman hebin jî, ez li gor Îranê bêhtir azad im.

**Wek hunermendek hûn îro nikarin vegerin cîhê lê dayik bûne. Ev hestekî çawa ye?**

Îro li cîhanê 40 mîlyon Kurd hene û di bin zilm û zordariyên mezin de dijîn. Welatên wan bûye 4 perçe. Jiyana wan perçe perçe bûye. Hinek ji wan di zindanan de ne. Hinek jî li sirgûnê dijin. Yên mane jî di bin zilmê de ne. Li Tirkiyê, Îran û Suriyê rewş wek hev e. Ev rejîm nahêlin Kurd çand û hunera xwe bijîn. Lê ez bawer dikim ku Kurd bi tekoşîna xwe wê rojek azadiya xwe bigirin.

**Hûn îsal serokê juriya 47. Festîvala Fîlm a Navnetewî ya Antalyayê bûn. Di vî warê de em dikarin hestê we bigrin…**

Ev tiştek gelek baş e ji bo sînemaya Kurd. Derhenêrek Kurd, cara yekemîn li Antalyayê bû serokê juriya festîvalê. Ev pêşketina sînemaya Kurd û derhenêrên Kurd nişan dide.

**Niha li Herêma Kurdîstanê rewşa sînemayê çawa ye?**

Zehmet e. Her tişt tevlihev e û sîstemek rast nîne. Ez hevîdarim ku, ev tişt wê bên guhertin. Eger neyên guhertin bi vî awayî rewşa sînemaya Kurd wê xirabtir be.

**Tê gotin, li Herêma Kurdîstanê ji bo sînemayê pere didin û tiştên baş çêdibin…**

Rast e, pere heye û tê dayin. Lê sîstemek tune. Wezareta Rewşenbîrî li vî karî dinêre. Di wir de jî pirsgirêkên sîstemî hene.

**We li Antalyayê jî gotibû ‘sînemaya Kurd bê bav e’. Baş e ev pirsgirêkên sînemaya Kurd wê çawa bên çareserkirin?**

Li gor nêrîna min sînemaya Kurd îro bê bav e. Zarokek sêwî ye. Divê em ji vê rewşê xilas bin. Ji bo wê jî divê hikûmet biryarek bide. Di nava Wezareta Rewşenbirî de komîsyonek sînemayê ya ji 10 kesî pêk tê, bê sazkirin. Ev kom divê li ser sînemaya cîhanê xwediyê ezmûnan be û ji sînemaya cîhanê jî sûd bê girtin. Li alîye din berî her tiştî endustiriyeke sînemaya Kurd bê avakirin. Wexf û saziyên din bên damezrandin. Ez li vir bang li Neçîrvan Barzanî dikim; bila derfetên xwe yê şexsî bi kar bîne, di demek nezîk de li Herêma Kurdîstanê festîvalek fîlman a navnetewî bê li darxistin. Wê gavê Kurd wê ji bo xwe sînemayê çêbikin. Wê gavê fîlm, li gorî hesasîyeten temaşevanên Kurd bên kişandin. Ev dibe gava pêşketin a sînemaya Kurd. Derhenêrên Kurd niha ji bo raya navnetewî fîlman çêdikin. Ev bi serê xwe têr nake.

**Îsal Festîvala Navnetewî ya Pusan ê ji bo sînemaya Kurd ‘beşek teybet’ avakir û 10 filmên Kurd nişan da. Hûn di vî warêde çi dibêjin?**

Pusan festîvalek herî mezin a Asyayê ye. Nîşandina fîlmên Kurd li Pusanê gelek baş e. Sînemaya me hê nû nû pêş dikeve. Têkiliyên wisa gelek girîng û heja ne. Divê em van têkiliyan zêdetir xurt bikin.

**Gelek cîwan îro di festîvalên fîlmên navnetewî de bi xelat vedigerin û serkeftî ne. Hûn ji bo sînemaya Kurd ev mînakan çawa dinirxînin?**

Ev diyardeyên gelek baş in. Ji bo sînemaya Kurd û derhênerên Kurd serkeftiyeke mezin e. Ev xelatên ku distînin baweriya ciwanan xurt dike. Ev jî tê wê wateyê ku fîlmên baş zêdetir tên kişandin.

**Ji bilî ev proje tiştek nû yê din di destê we de heye?**

Erê heye, lê naxwazim bêjim. Gelek zû ye. Lê karê sînemayê li vir gelek zehmet e. Divê şert û mercên sînemayê bên amadekirin.

***Hevpeyvîn: Alî Guler***





**Bahman Qubadî di 2009’an de li Festîvala Cannesê xelata taybet wergirtibû**


**Bîografî**

Bahman Qubadî di sala1969’an de li Rojhilata Kurdîstanê, li bajarê Bane hatiye dinyayê. Sînema hertim di dilê Qubadî de wek agirek sor bû. Berê li cem wênekeşek dest bi kar dike. Dû ra dest bi perwerda sînemayê dike. Perwerde di nîvî de dihêle û dest bi çêkirina fîlman dike. Bi derhênerên navdar ên Îranî, wek Abbas Kiarostami kar kiriye. Dû re dest bi fîlmên xwe yên dirêj dike. Qubadî di serî de li Cannes, Berlînale, San Sebastîan Rotterdam u gelek festîvalên navnetewî xelat wergirtiye. “Dema Hespên Serxeş”,” Kusî jî dikarin bifirin”, “Nîvheyv” fîlmên wî yên navdar in. Derhenêr niha jî di fîlmê nû de li ser çîrokek behsa jîyana Kurdek dike.

www.arsivakurd.org

# Bi roj peykeran, bi şev jî resiman çêdike

Xeyala Xefûr Hûseyîn ew bû ku rojekî li Amedê pêşangeh veke; wî mala xwe anî vir û ev yek pêkanî. Niha dixwaze berê xwe bide Herêma Kurdistanê.




Xefûr Hûseyîn li pêş tabloyekî Ahmet Kaya

**Bawer Çem** Amed

Resamê navdar ê Qamişloyê Xefûr Hûseyîn ku ji bo hunereke baştir terka Sûriyê kir û li Amedê bi cih bû, hêvî, keser, kul û kederên xwe di tabloyan de dinexşîne. Xefûr, ji bo debara mala xwe bi roj di parkan de ji bo şaredariyê peykeran çêdike û bi şev jî tabloyan diresmîne.

Resamê Kurd Xefûr Hûseyîn ku heta niha ji 2 hezarî zêdetir tablo çêkirine û li cihên cur bi cur nêzî 50 pêşangehan vekirine, çîroka hatina xwe ya Amedê ji Rûdawê re vegot. Li gor resam Hûseyîn, wî hêj di 5 saliya xwe de li ser defterên birayên xwe xêz çêdikirin û ev xêzên wê rojê bûne pêşeroja resamiya wî. Xêzên pêşîn ku di zarokatiyê de avêtibû, pêşeroja Hûseyîn jî diyar kiribû. Li Qamişloyê piraniya wexta xwe ji çêkirina resiman re vediqetand. Bi çêkirina tabloyên sûrealîst êdî nav û dengê wî li bajarên derdorê belav bûbû. Lê ev yek têra wî nedikir. Ji bo ku hunera xwe pêşdetir bibe, beriya 3 salan biryar da ku berê xwe bide Bakurê Kurdistanê, Amedê. Hûseyîn ku ev 3 sal in li Amedê dijî, wiha axivî: "Hevjîna min û du zarokên min li Qamişloyê man, ez jî li vir. Min li vir pêşangeh vekirin û li derdorê xwe da nasîn. Di warê aborî de gelek pirsgirêk jiyam. Ji ber vê yekê bi roj diçûm li xerat (necar) dixebitîm û bi şev jî min tablo diresimand. Ev çend meh in min dev ji necariyê berdaye. Niha bi roj li baxçeyên parkan ên şaredariyê peykeran çêdikim, êvaran jî resiman çêdikim."



Xefûr Hûseyîn tabloyan li mal çêdike, peykeran jî li derve

### Di mala xwe de ders dide


Ev çend meh in Xefûr Hûseyîn malbata xwe jî aniye ba xwe û li Baglara Amedê ji xwe re xanî girtiye. Di du odeyan de ew û malbata xwe dimînin û odeyeke xanî jî weke atolyeya resiman bi kar tîne. Hûseyîn ku ders dide şagirtên resimê, diyar kir ku odeyek têra wî nake û wiha axivî: "Niha hem xwendekarên zanîngehê û hem jî kesên din tên li ber destê min hînê resimê dibin. Ez heftiyê du rojan ders didim wan û heqdestê xwe ji wan distînim." Hunermendê Kurd ku heta niha wêneyên Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Cegerxwîn û Mûsa Anter çêkiriye, li şaneşîna mala xwe tabloyekî 2 metro yê Ahmet Kaya daleqandiye. Hûseyîn, niha jî portreyeke Aramê Tîgaran ku ji 2 metropan pêk tê, çêdike.

### 'Dixwazim biçim Başûr'

Xefûr Hûseyîn, destnîşan kir ku berê daxwaza wî ya herî mezin li Amedê vekirina pêşangehan bû, ew gihiştiye miradê xwe û niha dixwaze li bajarên Herêma Federal a Kurdistanê pêşangeh veke. Hûsên vê daxwaza xwe wiha anî zimên: "Ez pir dixwazim li Başûrê Kurdistanê pêşangeh vekim. Çimkî êdî çavên me hemû Kurdan li wir e. Ewder hêviya me ya azadiyê bilindtir dike."

Çiya Mazî

## Kurdewarî û wêjevaniya kurdî



Kurdewarî di ferhengê de wekî "taybetmendiya Kurdan" tê binavkirin. Jiyana Kurdan a civakî, têkiliyên mirovan, hestên wan, kerb û kenê wan, çêr û gefên wan, giş dibin xuy û taybetmendiyekê çêdikin. Ew taybetmendî, mirovan û civakan ji mirovên din û civakên din vediqetîne.

Dema ku dibêjin "Kurdewarî" ev wateya jor tê bîra min. Dema ku mirov an wêjevanên Kurd behsa wêjeya Kurdewarî dikin jî ev tê bîra min û baweriya min ku mirov ji teksteke kurdî re bi dilgermî bibêje ev wêjeya Kurd e, divê Kurdewarî hebe û taybetiyeke kurdî xuya bike.

Ma ne "wêje" bi xwe ji jiyanê tê û li ser kok û rehên jiyanê bilind dibe? Bi awayekî din, wêjevanek çiqasî bi jiyan û zimanê gelê xwe zanibe û bi wî zimanî binivisîne, wê ewqas bi pêşkeve. Ev yek wê ewqas wî wêjevanî bike aîdî wî gelî. Ji ber wê taybetmendiyê jî, ji derveyî gelê wî jî, wê alem wî bi wê taybetiyê nas bike û rûmetê bidê.

Gelo yê ku jiyana gelê xwe nizanibe û tenê ziman di dibistanan de hîn bûbe, wê çiqasî wêjeya netewa xwe bi pêş ve bibe? Dibe ku pir bi awayekî akademîk jî ziman zanibe, lê bi baweriya min eger fen û fûtên zimanê xwe, çiv û dûvên wî, xeber, argo û erotîzma wî, arabeskî û absurdiya wî zimanî nizanibe, wê ew wêjevan, wêjeya wê netewê ji rê derxe û bi dereke din ve bibe. Wekî mînak em bibêjin; yekî Îngilîz jî dikare bi rêya dibistanê hînî kurdî bibe û nivîsan binivîse, lê wêje tiştekî din e, bi peyva "nivîs"ê nayê şîrovekirin. Pirsa ku dibêjin "kî wêjevanê Kurd e" an "esilkurdên ku bi tirkî, erebî dinivîsin wêjevanê Kurd in" jî, mirov dikare bi vê hizrê şîrove bike. Bi rastî hinek esilkurd bi jiyana Kurdî dizanin û alîkariya bişavtinê jî dikin. Mirov nikare sînorekî stûr jî deyne, bibêje "ew ne Kurd in, ne wêjevanên Kurd in" lê bi hêsanî mirov dikare (qet nebe ez dikarim bêjim) ew ne wêjevanên zimanê Kurdî nin.

Ma gelo yên nizanibin; çirtovirto, quzelqurt, mirmir, hilhile, gidiyano, helkehelk çi ye, wê çawa wêjevaniya Kurdî bikin? Yên nizanibin hilozbûn, hîrhîr, kişkişandin, keftûleft, lewlew, pelipel, pitpit, serjinik, teres, tewşomewşo çî ye, wê çawa tahmê bidin çîrokên kurdî û ji ziman tahmê bistînin? Yên nizanibin; tewtewe, şaqîn û waqîn, tiyax, keşxe û virrek çî ye, wê çawa helbesta kurdî binivîsin?

Gelo yekî ku çîrokeke wî li nava xerzikan derbas dibe, nizanibe; kesax, kesme û keşmûn çî ye û nikaribe bang bike bibêje "selik seliiiiiik", wê çiqasî wêjeya wî zîmanî bi pêş ve bibe û bi giyanê wî re çawa bike gerdûnî?

Welhasil kî dibe bila bibe, tu dixwazî bila biyan û bi kurdî binivîsîne, tu dixwazî bila Kurd be û bi kurdî wêjeyê biafirîne; divê baş bi kurdî û rihê wî zanibe. Ne ji bo kurdî û kurmancî tenê, ji bo zimanên dinyayê û zaravayê kurdî î din jî wisa ye.

REKLAMA WE
dikare li vir be!
Rojnameya Rûdawê bi erzanî reklam û peyamên we dighîne bi hezaran sermayedar û xwendevanên Kurd
Serî li me bidin:
Buro: +49 (0) 221-26 00 4002
Mobil: 0152-54 86 5621
e-mail: rudawname@googlemail.com

www.arsivakurd.org

# Melayên jin xwediyên şînan talan dikin

Li Herêma Kurdistanê 160 jinên destûrdayî hene ku dikarin tevlî şîn û merasîmên olî bibin. Lê hin melayên jin ên bêyî molet jî di şînan de Quranê dixwînin.

**Necîbe Mihemed** Hewlêr



**Li Herêma Kurdistanê melayên jin di şînan de Quranê dixwînin**

Malbata Şîraz Mizefer (20) bangî melayeke jin kirin ji bo ku di şîna bavê wan de Quranê bixwîne, lê wê melaya jin yek ayeta Quranê jî nexwend û pere jî ji wan wergirtin. Şîraz dibêje: "du rojan me telefona wê kir heta hat, roja duyem a şînê du demjimêran li defê xist û hinek sirûd xwendin, lê ayeteke Quranê jî nexwend."

Rewşa darayî ya malbata Şîraz ê nebaşe: "dema melaya jin merasîm xelas kir daxwaza 250 hezar Dînaran kir, lê got ji ber hûn hejar in 180 hezar Dînaran bidin. Di dema dabeşkirina şerîniya mewlûdê de jî, melaya jin ji me re got beşê min û zarokên min cuda deynin."

Wek çawa di şîna mêran de Quran tê xwendin, êdî di şîna jinan de jî tê xwendin. Xwediyên şînan giliyê li melayên jin dikin ku wek pêwîst giringiyê nadin xwendina Quranê di şînan de û tenê dixwazin pereyan bidin hev.

### Di şîna jinan de awazên heyran, siyaçeman, def û daholê hene

Xwediyên şînan dibêjin ku xwendina Quranê di şîna jinan de tiştekî zêde ye, lê piraniya wan ji ber lomên xelkê, gazî jinên melayan dikin. Fewziye Elî (40) ku berî du mehan dayika wê miriye dibêje: "baweriya min pê nayê ku melayên jin bên di şîna jinan de Quranê bixwînin, ji ber jin ji ber axaftina di navbera wan de haya wan ji xwendina Quranê namîne, gunehbar jî dibin, ji bilî ku piştî şînê melaya jin bi kêfa xwe daxwaza pereyan dike, bêyî ku rewşa darayî ya xwediyê mirî li ber çav bigre." Fewziye yek ji wan e ku ji ber 'lomên xelkê' melayeke jin bo şîna dayika xwe anî.

Mele amaje didin ku merasîmên bi navê şînê li Kurdistanê ji bo miriyan tê kirin di Îslamê de behsa wê nehatiye kirin, lê kevneşopiyeke xelkê ye, nemaze şîna jinan.

Mela Mezher Şêx Tahir Zeynelabidîn derbarê xwendina Quranê di şînan jinan de got: "Heram e jin bi dengekî bilind Quranê bixwîne û li derve xelk guhdariya dengê wê bikin, herwiha gelek jinên ku Quranê dixwînin xelet dixwînin û bi vî hawî gunehbar jî dibin. Baştir e xwediyê şînê CD û tomarê bikar bîne ji bo Quranê." Navborî rexne li şîna niha ya jinan digre û dibêje: "niha şîna jinan û sirûd bi awazên heyran, siyaçeman û def û dahol lêdanê dixemilînin."

Derbarê wergirtina pereyan beramber xwendina Quranê di şînê de, Mela Mezher, got: "Îslamê rê nedaye vî karî, kesê di şînê de bi pereyan Quranê bixwîne, Xweda wî dişîne cihê herî nexweş ê dojehê 'weyl'."

Li Herêma Kurdistanê hinek jinên destûrdayî hene ku dikarin tevlî şîn û helkeftên olî bibin. Hejmara wan jinan nêzîkî 160 e, wan ji aliyê Wezareta Ewqafê molet wergirtine. Kurdistan Hesen (28) ku berpirsa van 160 jinane got: "160 melayên me hene, hemû moletkirî ne, nasnameyên wan hene û divê di şînan de bi xwe ve bikin." Kurdistan ku xwedî tekiyeye û wek Xelîfe Kurdistan tê naskirin, eşkere dike ku hinek melayên jin ên bêyî molet jî hene diçin şînan: "ev mele di dema xwendina Quranê de xeletiyên zêde dikin."

Niha li her taxekê şînî hebe, konek tê vedan û bi dirêjiya dema şînê li kolana ku kon lê tê vedan, trafîk têk diçe. Derbarê girtina kolanan, Xelîfe Kurdistan dibêje: "em çend caran ligel Parêzgar rûniştin û me daxwaz kir ku çend salonekan ji bo şînên jinan bên vekirin, lê hê tiştek nehatiye kirin."

### 2 hezar Dolar ji bo xwendina Quranê

Xelîfe Kurdistan red nekir ku mele pereyan li şînan werdigrin û got: "helale", lê bazarkirina li ser perên xwendina Quranê heram dibîne: "nabe bazar li ser xwendina Quranê bê kirin. Heta niha hevwelatiyan gilîname li ser 8 melayên jin li cem me kirine, hinek melayên jin 2 hezar Dolar ji xwediyê şînê wergirtine. Em li gor rêbazên Wezareta Ewqafê kar dikin, ku ji bo her şîneke 100 hezar Dînaran werbigrin."

Her çiqasî Wezareta Ewqafê di dema borî de pêşniyar kir ku ji bo xwendina Quranê CD û kasêt bên bikaranîn û biryar derket şîn ji 3 rojan bibe 2 roj, lê hevwelatiyan ev yasa bicîh neanîn û niha jî melayan tînin şînên xwe. Berdevkê Wezareta Ewqafê, Merîwan Neqişbendî, ku xwediyê fikirê jî bû got: "ev proje alîkariyeke başe ji kesên ku rewşa wan a borî ne başe û nikarin mele bînin şînê." Derbarê qedexekiina xwendina Quranê bi peran ji aliyê Wezareta Ewqaf, navborî wiha axivî: "her kesê bêyî molet nikare Quranê bixwîne, kesê bixwîne jî nikare daxwaza zêdeyî 100 hezar Dînaran ji xwediyê şînê bike, ger binpê kir Wezareta Navxwe dikare wî bigir e."

## Kujerên jinan nayên girtin

**Soran Behaeddîn**

Kuştinên namûsê li Herêma Kurdistanê zêde ne û pir caran jin û keç lis er tometeke çêkirî tên kuştin. Li gor şopandina Rûdawê li ser hin dosyayên jinên ku di sala borî de hatine kuştin, heta niha ti kes li ser kuştina wan nehatiye binçavkirin.

Li gor serjimêriya Wezareta Mafên Mirovan, sala 2008'an li Herêma Kurdistanê 117 jin hatine kuştin; li Hewlêrê 52, Silêmanî 43 û Duhok 22. Herwiha 346 termên jinan li Herêma Kurdistanê ji bo peymangeha pizîşkî ya dadwerî li Hewlêrê, hatine şandin.

Rêvebirê Şopandina Tundûtûjiya Dijî Jinan li Hewlêrê, Komîser Jîlemo Evdilqadir, ragihand, ew ê ji bo girtina kujerên jinan hewldanên xwe bidomînin: "ji sedî 70'ê kujerên jinan girtî ne, kesên ku hê nehatine girtin jî cihê wan nediyar e, reviyane derveyî Herêma Kurdistanê, hinek diçin bajarên Îraqê û hin jî direvin derveyî Îraqê."

**Tendirustî**

## Apandîs

Apandîs organeke ku şiklê wê wek tupê ye û dirêjiya wê jî 6- 8 cm e. Li binzik û li aliyê rastê cihê xwe digre; hucreyê lenfa jî tê de hene ku antîkor çêdikin. Li seranserê cîhanê ji ber nexweşiya apandîsê gelek mirov ameliyat dibin. Li ser apandîsê tişta herî baş tê zanîn ew e ku mirov dikarin bêyî wê jî bijîn.




**Dr. Îbrahîm Gunêş**

**Hûn dikarin ji me re bahsa apandîsê bikin?**

**Dr. Îbrahîm Gunêş:** Apandîs bi roviya kor ve girêda ye, şiklê wê weke tiliya zirav e û di dawiya roviya qalind de cihê xwe digre. Rola apandîsê çêkirina fîltreyê ye da ku bakteriyan paqij bike û di hindirê xwe de wana bê bandor bike û bedena mirov ji bakteriyên nebaş biparêze. Ji xwe apandîs bi roviya qalind ve girêda ye û li ser hemû roviyan bandora wê heye.

**Çend rengên apandîsê hene?**

Bi navên Apandîsa Akut û ya Kronik du şêweyên wê hene. Apandîsa Akut iltîhaba roviya kor e, roviya kor diwerime û îltihab digre, ji ber wê jî zikê mirov diêşe û mirov vedireşe, dilê mirov lihevdikeve, zikê mirov diçe, germbûna canê mirov zêde dibe. Ji ber wê jî binzikê mirov ê rastê diêşe û birêveçûn zehmet dibe. Dema ku mirov destê xwe bide ser gelek diêşe. Hingê jî bi tevlî xwînê Loksit, Limfosit, ASL bilind dibe, pişt re pêwîstî bi emeliyatê dibe. Apandîsa Kronîk jî car carnan çêdibe û êşa wê destpêdike, ew jî dîsa dibe sedema lihevketina dil û êşa zik, lê mirov zêde ji ber nerihet nabin. Ev dibe ku di tevahiya jiyana mirov de bimîne, ji ber ti zirara wê tune.




**Carna apandîsa mirov diteqe, metirsiyê wê çi ne?**

Dema ku apandîsa Akut zu neyê ameliyatkirin ew diwerime, an jî dirize û diteqe; wê demê hemû bakteriyên hundirê wê li valahiya zik belav dibe, hingê jî zik û xwîn tê jehrdayîn. Ji ber wê jî pêwîst e ku bezîjk zêde zik vebike û hemû organên hundir derxe derve, bi antîseptîkan û antîbîotîkan bişo û paqijbike û careke din bixe cihê wan, pişt re jî tedawiya êşê û îltihabiyê bike. Lê apandîsa kronîk bi dermanê êşê tê çareserkirin.

**Apandîs bi taybetî bi kî re tê xuyakirin?**

Apandîsa Akut ji sedî 70-80 bi ciwanên 8 -15 salî re çêdibe, ev jî ji ber ku xwarin û vexwarinên ne baş û ne paqij dixwin, sedemek din jî qelsiya berxwedana canê wan e. Apandîsa Akut bi mirovên mezin re pir kêm çêdibe; yên ku bi wan re çêdibe jî disa sedem xwarin û vexwarin in. Lê piştî emeliyatê ti kêmasî di canê mirov de nayê xuyakirin. Dema ku mirov zu here bizîşk apandîz ne xweşiyeke metirsdar e.

**Amadekirin: Zelal Çelîk**

***Dr. Îbrahîm Gunêş*** *ji Bakurê Kurdistanê ye, niha li Almanya dijî û pizîşka nexweşiyên hundir e.*

www.arsivakurd.org

Wezîrê Derve yê Îraqê, Hoşyar Zêbarî:

# Koşka Sipî û NY piştgiriya însiyatîfa Serok Barzanî dikin



Hoşyar Zêbarî, ku ji dema hilweşîna rêjîma Saddam Hûseyîn, Wezîrê Derve yê Îraqê ye, bêtir di medya cîhanê de tê dîtin û kêm li Kurdistan û di medya Kurd de derdikeve. Di vê hevpeyvîna ligel Rûdawê de, Zêbarî behsa qirîza avakirina Hikûmeta Îraqê û helwêsteke din a Serokê Lîbya Muemer Qeddafî dike, ku li pêşber hemû Wezîrên Derve yên welatên Ereb de piştgiriya serxwebûna Kurdistanê kir.

**Rûdaw: Di medya YNK'ê de herdem tê gotin ku Kurd ji bo pêkanîna hikûmetê nêzîkî Dewleta Yasa ne, lê di ragihandina PDK'ê de herdem pêdagiriyek heye ku pêwîst e hikûmeta dahatû hikûmeteke niştimanî ya hevbeş be. Bi rastî helwêsta Kurdan bo hikûmeta dahatû ya Îraqê çi ye?**

**Hoşyar Zêbarî:** Niha du rê ji bo damezrandina hikûmetê hene. Rêya parlamento ku dadgeha federe biryareke mecbûrî wergirt ku divê rûniştina vekirî bidawî bike û parlamento di nava du hefteyan de bicive û serokê demkî yê parlamento hatiye agahdarkirin ku divê parlamento dest bi karê xwe bike, ji ber domandina rûniştina vekirî karekî ne destûrî ye. [...] Ev rêyek e. Rêya din, pêşniyareke Serokê Herêma Kurdistanê heye ku pêwîst e lîsteyên di hilbijartinan de serketine hemû bi hev re bicivin. Lîsteyên serkeftî heta niha bi hev re neciviyane û danûsitandin herdem dûalî bûne. Niha nêzîka 8 mehan bi ser hilbijartinan re derbas dibin û civîneke bi vî rengî nehatiye kirin. Hikûmeta ku tê pêkanîn jî, divê hikûmeta şirîkatiya niştimanî be û hemû alî tê de beşdar bin. [...]

**Amerîka ligel kîjan rêyê ye?**

[...] Koşka Sipî daxuyaniyek da ku ew piştgiriya însiyatîfa serokê herêmê dikin, herwiha NY û Misir jî pêşwaziya wê kirin. Ev belge ye ku însyatîf pêngaveke serkeftî bû. Bingeha bihêzbûna wê jî ew e ku cenabê serok çavê xwe neberdaye ti postekê û di vê pirsê de ne alî ye, herwiha însyatîfeke Îraqî ye û ji derve nehatiye.

## "Ti kes bê lihevhatin nikare li Îraqê hikûm bike"

**Em dikarin bêjin Amerîka ne ligel wê yekê ye ku Kurd û Şîî bi tenê hikûmetê pêk bînin?**

Hinek xalên bingehînî hene. Her hikûmetek li Îraqê bê avakirin, divê hersê pêkhateyên serekî tê de beşdar bin, ji ber ger wiha nebe dengdan û demokrasî bê wate dibin. Loma çi Amerîka, yan welatên derdorê, pêdagiriyê li ser vê xalê dikin. Ji xwe girêk di vir bi xwe de ye.

**Û lîstika demokrasiyê û mafê dengdêr û aliyên piranî û kêmaniyê?**

Rewşa Îraqê vê yekê qebûl nake. Ti kes bê lihevkirin nikare hikûma Îraqê bike.

**Heta kengî?**

Heta ev millet bigihe astekî wiha ji têgihiştin û demokrasiyê ku opozîsyon hebe û hwd. Aliyê serkeftî her tiştî li Îraqê ji xwe re bibe, nabe. Herwiha li welatên zêde demokratîk jî post û pileyan didin kesekî ku ji partiyeke din e. Yanî, yekem divê Îraq bi tifaqî bê hikûmkirin û dûyem her hikûmetek lê bê avakirin divê hersê pêkhateyên serekî lixwe bigre. Sêyem, dibe ku serokwezîrê hikûmeta bê Şîî be.

**Berî bên kirin, we got ev hilbijartin ne yên gelê Îraqê ye, lê yên welatên herêmê ye...**

Ne wiha bû? Wiha derneket?

**Yanî her hikûmeteke bê avakirin, em dikarin bêjin hikûmeta welatên herêmî ye?**

Ger hikûmet ava bû û hikûmeta hevbeş a niştimanî nebû, wê demê em dikarin bêjin 'erê hikûmeteke herêmî ye û ne Îraqî ye'. Lê eger li ser bingeha beşdarîkirina hersê pêkhateyan bê avakirin, êdî hikûmeteke Îraqî ye. Însyatîf jî pêdagiriyê li ser vê xalê dike.

**Gelek caran behsa wêya tê kirin ku ger Lîsta Îraqiye beşdar bibe, derfeta Kurdan a bidestveanîna postê serokkomar kêmtir dibe û wê zerer bigihe gelê Kurd?**

Ger tu rastiyê dixwazî, divê Lîsta Îraqiye beşdar bibe. Ger beşdar nebe, wê pirsgirêk derkevin û tundûtûjî zêdetir bibe.

## "Kilît di destê Kurdan de ye"

**Kurd ji vê beşdarbûnê çi bidestdixin?**

Pêgeha Kurdan niha pir bihêz e. Niha em bûne yekalîker û kilît di destê me de ne, em piştgiriya kîjan alî bikin, wê biser bikeve. Ger em bixwazin herin cem Malikî, di du rojan de wê hikûmet bê ragehandin. An ger em piştgiriya Lîsta Îraqiye bikin, wê bi beşdariya civata bilind sibe hikûmetê pêk bînin. Loma beşê me her parastî ye.

**Mam Celal ji bo rojnameyekê ragehandiye ku Malikî hemû daxwazên Kurdan qebûl kirine?**

Piraniya wan a herî zêde qebûl kiriye, lê hinek daxwazên me mane ku hê qebûl nekirine.

**Wek çi?**

Wek mînak niha li welatekî Ewrûpî jî gava du partî hevbendiyê dikin, dibin şirîkên hev ên desthilatê. Ger aliyek vekişiya, yê din nikare hikûm bike. Ev yek ji daxwazên me ye ku hê qebûl nekirine û dibên bila bi formeke din be. Lê Dewleta Yasa ji hemû yên din zêdetir xwe nêzîkî me kiriye.

**Ji Lîsta Îraqiye jî zêdetir?**

Ji hemûyan. Lê êdî di siyaset û hevbendiyan de meseleya garantiyê tiştekî girîng e. Lê li gor min di siyasetê de garantî nînin. Garantî yekîtiya refên te û giraniya hêz û tevger û rola te ye.

**Tecrûbeya we ligel Elawî û Malikî jî heye, bi baweriya we kîjanê wan ji bo Kurdan baştir e?**

Divê em rastbîn bin. Em bixwazin an nexwazin Şîî li parlamentoyê piranî ne. Ger tu di hikûmetê de beşdar bî, divê ligel hikûmetekê bî ku îmkana berdewambûna wê hebe. Bê guman divê Sunî jî di vê hikûmetê de beşdar bin, lê ya girîng ew e kû herî zêde nêzîkê daxwazên me ye û ev e pîvan.

**Di nav raya giştî ya gelê Kurdistanê de gilî zêde ne ku Malikî sozên ku dabûn Kurdan pêk neanîn.**

Xemsariyeke zêde hat kirin. Hikûmeta navendî û Hikûmeta Herêma Kurdistanê xemsariya xwe nîşan dan. Li Bexda hinek kar hene nûnerên Kurd divê hemû tê de başdar bin, ev ne tenê karê çend nûnerekî yan Lîjneya Bilind a Maddeya 140'ê ye. Ev karekî niştimanî ye û divê hemû alî bi hev re hewl bidin.

**Diviyabû Hikûmeta Herêma Kurdistanê çi bikira?**

Hikûmeta Herêma Kurdistanê dikarîbû di asayîkirina rewşa van navçeyan de rolekê bilîze û hevkariya xelkê wan navçeyan bike.

**Lê dibêjin Serokatiya Komarê nekarî biryarê bide, ji ber çigirên wî xwedî mafê veto bûn?**

Xwezaya desthilatê bi xwe wiha bû, sê serokkomar hebûn. Her yek ji van xwedî mafê vetoyê bû, xuyaye di qonaxa dahatû de bi vî hawî nabe û tene serokkomarek dibe, lê desthilatên wî kêmtir dibin. Hê gelek pirsgirêk mane ku nehatine çareserkirin. Hemû hêviya me ev destûrê hanê ye ku hê bi tevahî nehatiye çespandin.

## "Metirsiya paşvestendina hemû mafan ji gelê Kurd heye"

**Pêdagiriya Kurdan li ser wêya ye ku Mam Celal bibe serokkomar. Li gor we vê carê ku serokkomarekî Îraqê Kurd be û duyên din yek Sunî û yek Şîî dibe, ev ji bo Kurdan tiştekî baş dibe?**

Pir behsa wê mijarê tê kirin ka gelo serokkomar Kurd dibe yan aliyekî din. Hê helwêsta me ew e ku em pêdagir in li ser berendamtiya Mam Celal ji bo serokkomariyê. Ji ber gelek sedeman metirsî heye ku ev pêngava yekem be ji bo şûnde stendina hemû mafên ku gelê Kurd bidest xistine, yek li dû yekê. Nabe ev hest bê dirustkirin ku mafê Kurdan nîne bibin serokkomar an wezîr. [...]

**Meseleya Wezareta Derve ku ev çend sal bûn di destê Kurdan de bû, niha di nav daxwazên Kurdan de zêde nayê behskirin. Bi ser de jî tê gotin ku dibe Kurd daxwaza vê wezaretê nekin.**

Niha şer ne li ser vêya ye, lê li ser sê postên din e. Hê em nehatine ser dabeşkirina wezaretan.

**Lê Kurd niha dibêjin em wezareta petrolê yan darayî dixwazin?**

Her tişt ne bi destê me ye. Kî dibêje Şîî amade ne Wezareta Petrolê bidin me, nemaze ku çavkaniya tevahiya dahata Îraqê ye. Em hê nehatine ser vê gotûbêjê, lê bê guman ji ber ku helwêsta me bihêz û yekgirtî ye, em ê beşa xwe ya wezaretên girîng jî bibin. Wezareta Derve jî, ne ji ber ku li wir wezîr im, bê guman wezareteke zêde girîng e û têkiliya wê ligel Herêma Kurdistanê zêde ye. Meseleya Kurdan û herêmê, meseleya serweriyê ye. Yanî wezaretên ku bi serweriyê ve têkildar in, ji bo derve Wezareta Derve ye û bo hundir jî Wezareta Navxwe ye.

**Hûn hest dikin atmosfêrek bi hole ku dewleteke Kurdî bê sazkirin?**

Mafê çarenûsê mafekî rewa yê hemû gelan e û di destûra Neteweyên Yekgirtî (NY) de heye. Vê carê dema em li zîrveya welatên Ereb li Lîbya bûn, rûniştineke wezîrên derve hebû. Muemer Qeddafî hat hundir û projeyekî wî ji bo vejandina Komkara Ereb û yekkirina welatên Ereb hebû. Qeddafî behsa wêya kir ku divê em wek YE bin û wek Tirkiyê bin û bi kêmanî wek Îranê bin û xelk rêza me bigre. Got hêz û perên me ji yên wan zêdetir in, lê ew îradeya me tune û got jî dema vê yekê dibêjim nayê wateya ku gelên me yên din nînin û mafê wan nînin û got netewa Kurd jî heye ku neteweyeke mezin e û cîrana me ye, mafê wan jî yê yekbûn û serxwebûnê heye. [...] Ti kesî axaftina wî ya li ser netewa Kurd şîrove nekir, heta dora Wezîrê Derve yê Sûriyê Welîd Mûalîm hat, ku ew jî dostekî me ye. Welîd Mûalîm got: "Têbîniyên me li ser tiştên te behsa wan kir nînin, lê em ne ligel damezrandina dewleteke Kurd in." Qeddafî bersiva wî da û got 'baş e hûn Baasî ne, slogana Baasê jî eşkere ye ku dibêje 'yekîtî-azadî-sosyalîzm'. Azadî li cem we azadiya mirov e, yan milletan e? Eger hûn li vêya mikur neyên, wate hûn ligel bîrûbaweriyên xwe ne rast in.' Min jî di wê demê de bi xurtî jê re li çepikan da. Amadebûyan dest bi ken kirin. Wezîrê Derve yê Sûriyê Welîd Mûalîm ku li tenişt min rûniştibû got, ha te xwe eşkere kir? Min got ez her ev im, lê we xwe hetikand.

*Tevaya hevpeyvînê:*
***Di www.rudaw.net de bixwîne***

www.arsivakurd.org


# Bajarê bazirganî û pîşesaziyê: Dîlok

Bi baweriya mamostayekî zanîngehê, cografiya Dîlokê, herwiha av û hewayê wê bûne sedema pêşketina bazirganî û pîşesaziyê.

**Endam Muhsin Gerdî**

Bajarê Dîlok (Entab) li Bakurê Kurdistanê êdî bi berhemên xwe yên navxweyî li seranserê cîhanê bûye xwediyê nasnameyekê û niha berhemên vî bajarî li piraniya welatên Asya, Ewrûpa û Amerîka belav bûne.

Dîlok Bajarekî dîrokî û kevin e. hejmara rûniştvanên wê digihe zêdeyî yek milyon kesî, heştemîn bajarê mezin ê Tirkiyê ye.



Li Dîlokê Fisteq, kargehên mafûran, maddeyên kîmyayî, caw, pembû, çîmento û gelek tiştên din hene

### Berhemên Dîlokê

Taybetmendiya Dîlokê hebûna çend berhemên navxweyî ye, ku bûne sîmaya nasandina bajêr. Fisteq berhema yekemîn e. Loma Dîlok li Tirkiyê wek bajarê fisteqan tê binavkirin. Piştî fisteqan jî, şêranî tê. Paqlaweyên wê li seranserê Tirkiyê û Bakurê Kurdistanê binav û deng in. Tê gotin jî: “ger serdana Dîlokê bikî û paqlaweyên wî bajarî nexwî, wek ku te serdana Dîlokê nekiribe.” Zêdebûna dikanên şêraniyê li vî bajarî vêya bo mirov îspat dike.

Li gor tesnîfên Odeya Bazirganî ya Dîlokê, ev berhem li vî bajarî hene: Fisteq, kargehên çêkirina mafûran, maddeyên kîmyayî, caw, pembû, mişmişêm hişk, çîmento û berhemên xweliyê, ji ber taybetiyeke xweliya Dîlokê heye ku dikare şûşe û çend maddeyên din jê bên çêkirin.

### Peywendiyên bazirganî

Dîlok têkiliyên bazirganî yên bihêz bi welatên cîhanê wek Amerîka, Almanya, Holenda, Îtalya, Fransa, Yûnanistan, Belçîka, Brîtanya û Rûsya hene; herwiha bi welatên Asyayî bi Tacîkistan, Qirqîzistan û Îran û ji welatên Ereb, Sûriyê, Erebistana Siudî, Lîbya û Îraqê re jî têkilî hene.

Li gor agahiyên Odeya Bazirganiya Dîlokê, di sala 2008’an de henardeyên bajar 3 milyar û 164 milyon Dolar bû, pişka herî zêde ji vê dahatê ketiye ber Îraqê ku milyarek û 628 milyon Dolar e û bazirganiya alavên hawirde kiriye. Îtalya di pileya dûyem de cih girtiye ku bi qasî 197 milyon Dolaran alav hawirde kiriye û salane ev dahat zêde dibe.

Mamosteyê Zanîngeha Dîlokê, Husnu Ugur, derbarê taybetmendiyên bazirganî û pîşesaziya bajar dibêje: “dîroka bazirganî li vî bajar vedigere demeke pêş niha, ev jî wek faktorek giring bandor li ser bazirganiya vî bajarî kiriye. Herwiha av û hewaya bajarê Dîlokê ji bo bazirganî û pîşesaziyê pir baş e, ji ber ku heta astekê hişk e, ji aliyekî din ve ev bajar dikeve ser sînor ku ji bo veguhastina alavan faktorek bihêz e.”

Oxir behsa çend fakterên din jî dike ku bandor kiriye li ser pêşkeftina Dîlokê di warê bazirganî û pîşesaziyê de wek şarezabûn derbarê bazirganîkirin, pêşkeftina pîşesazî bi egera hebûna sermaya zêde û hêza kar a erzan ku fakterek pir girîng e.

Oxir axaftina xwe wiha bi dawî anî: “Li vî bajarî nêzîka 2500 kargehên cuda hene. 180 hezar karker li Entabê, ku 100 hezar ji wan li çar navçeyên pîşesazî yên rêkxistî kar dikin, hene.”

Abonetiya Rûdaw

Aboneti

Ez dixwazim bo dema

☐ Şeş mehan ☐ Salekê ☐ Vekirî

bibim aboneyê/ya rojnameya Rûdaw.

Rojnameya min heftane bişînin vê navnîşanê

Nav :
Paşnav :
Navnîşan :

Telefon a min :
E-Mail a min :

Buhayê abonetiyê ji vê kontoyê bikşînin;

Hejmara kontoyê :
Şîfreya bankê (BLZ) :
Bank :
Xwediyê kontoyê :

Dem û cih: Destnîşan:

Anjî ezê bihayê abonetiyê bişînim ser kontoya Rûdawê ya li jêr û dekontoya wê ji navnîşana Rûdaw re bişînim.

Bihayê abonetiyê salekê ji bo nav Almanya: 60Euro
Bihayê abonetiyê şeş mehan ji bo nav Almanya: 30Euro
Ji bo abonetiya derveyî Almanya, pêwendî ligel Rûdawê deynin.

**Hesabê Rûdaw**
Rudaw Media GmbH
**Bank** Deutsche Bank Köln
**Konto Nr** 2450161
**BLZ** 37070024

**Navnîşan**
Rudaw Media GmbH
Gutenbergstr. 63a
50823 Köln / Almanya
info@rudaw.eu

# Ji sedî 70’ê masiyên Kurdistanê ji derve tên

**Bîlal Seîd** Hewlêr

Li Herêma Kurdistanê bazara masiyan geş dibe û li gor aliyên peywendîdar ji sedî 70’ê masiyên Kurdistanê ji Îran û navenda Îraqê tên. Masîfiroş Qadir Selah dibêje: "piraniya masiyên Hewlêrê ji Musil, Samera û Îranê tên, ji ber masiyên navxweyî kêm in û têra xelkê nakin."



Rêvebirê Berhemanîn û Vejandina Samana Masiyan li Wezareta Çandinî û Çavkaniyên Avê ya Hikûmeta Herêma Kurdistanê, Sîrwan Seîd gilî dike ku wek pêwîst girîngî bi berhemanîna masiyan nayê dayîn: "loma neçar in rojane moletê bidin hatina rêjeyeke zêde ya masiyan."

Pisporê samana masiyan li Wezareta Çandiniyê, Nasir Ezîz Reşîd, ji bo Rûdawê diyar kir ku sala 2009’an tenê 150 ton masî li Kurdistanê hatine berhemanîn û 3 hezar ton ji bajarên naverasta Îraqê û 2 hezar ton jî ji Îranê hatine Kurdistanê.

Piştî sala 2000’an berhemanîna masiyan li Herêma Kurdistanê vejiya û li gor îstatîka Wezareta Çandinî û Çavkaniyên Avê ya Herêma Kurdistanê niha 285 projeyên xwedîkirina masiyan li bajarên Herêma Kurdistanê hene. Ji van projeyan 162 li Hewlêrê ne, 27 li Dihokê, 63 li Silêmaniyê û 33 jî li Germiyan in.

Rêvebirê Berhemanîn û Vejandina Samana Masiyan amaje dide ku salane pêwîstiya Herêma Kurdistanê bi 5 hezar tonên masiyan heye, lê 150 tonan berhem tîne. Li gor Nasir Ezîz, ger wezaret alîkariya vê rêvebiriyê bike û li gor plana 5 salî ya ku wezaretê daniye kar bê kirin, wê hêza berhemanîna navxwe salane bigihe 6 hezar û 700 tonên masiyan: "ger bi awayekî baş sûd ji gol û bendavên Kurdistanê bê wergirtin, dikare rêjeya berhemanîna masiyan bi awayekî xeyalî bê bilindkirin heta cihekî ku emê bikarin masiyan bişînin derveyî Herêma Kurdistanê."

Nasir Ezîz diyar dike ku li gor pîvanên cîhanî pêwîst e her kesek salane 19 kîloyên masiyan bixwe, lê li Kurdistanê salane 300 gram tên xwarin. Firoşkarê masiyan li Hewlêrê Hozan Casim behsa nirxên masiyan li sûkên Hewlêrê dike û dibêje: "nirxê wan di navbera 3- 9 Dolaran e."

Niha firotina masiyên zindî li bazarên Kurdistanê zêde bûye û çend corên masiyên Newzelandî peydabûne. Tevî ku li gor agahiyan zêdeyî 36 corên masiyan li avên Herêma Kurdistanê de hene.

www.arsivakurd.org

# Kayê “Ti Gara Nîyî” Dîyarbekir de ame kay kerdene

**Dîyarbekir (Rûdaw) -** Ti Gara Nîyî (Sen Gara Değilsin), nameyê kayêkê populer yê tîyatroyî yo. Kayêko sade, basît, hetê hîrê kaykerdoxan ra kay beno. No kay hetê nuştoxê tirkan Ezîzî Nesînî ra nusîyayo û hetanî ewro hetê gelêk grûbanê tîyatroyî ra ameyo kay kerdene. Kayî de bi hawayêko mîzahî tinaz bi sifetê qaremananê seserra 20. yeno kerdene, bi hawayêko mîzahî sîyaset û sîyasetkarî rexne benê. Tam uslûbêko hîcvî yê Ezîz Nesînî.

Gara bi xo karakterêko winasî yo ke zêde zanayîşê xo çin o. Şar vano qey o ceng de şehîd kewto. Hewceyîya şarî û sîyasetî bi qaremanêk esto. Werzenê bi vat-vatenê mubalexeyan Garayî xo rê kenê qareman û meydanê şaristanî de heykelê ey ronanê. La çira Garayo rastikên bi xo nêvejêno û nêno! Kay wina dewam keno…

No kay verê cû tercumeyê lehçeya kurmanckî bibi û amebi kay kerdene. Nika zî tercumeyê lehçeya kirdkî bi. Reya verêne Dîyarbekir de, roja 19.10.2010, şan de saete 8 de, salona Beledîye de hetê kaykerdoxanê “Tîyatroyê Şaristanî (Şehir Tiyatrosu)” yê belediye ra ame kay kerdene. Serekê belediya girde yê Dîyarbekirî Osman Baydemir û cinîya xo, serekê belediya Sûrî ya Dîyarbekirî Abdulah Demirbaş û serekê belediya Yenîşehîrî Selîm Kurbanoğlu zî tede qasê 250 kesan kay temaşe kerd.

Na reya verên e bîye ke Dîyarbekir de yew kayê tîyatroyî bi kirdkî (zazakî) ameyêne kay kerdene. Coka şarî bi eleqeyêko germ bala xo da kayî ser, hetanî peynî bi dîqet temaşe kerd.


Seke mi cor ra zî va, kay xora kayêko hadre û meşhur o. Ez wazena karê kurdanê ma ser o çend çîyan vajî. Bi kirdkî pêşkêşkerdişê kayî çîyêko muhîm o, ganî merdim teqdîr bikero. Mi gore dekorê sehneyî hol bi û her hîrê kaykerdoxî zî rolê xo de serkewte bîy. Wina asayêne ke zerrî ra xebitîyay, xo weş amade kerdo. La hetê ziwanî ra problemê zaf cidî estbîy. Kaykerdoxî hetê telafuzê ziwanî ra qasê nêmeyê rolê xo zî serkewte nêbîy. Esas tercume zaf xirab bi. Ziwanêko viraşte, teberê qaydeyanê kirdkî de amebi şuxulnayene. Kirdkî bi zor kerdebî sey kirdaskî la ziwan zaf xeripîyabi.

Çend formê çekuyan hetê Sêwregi û Pîranî ra dekerdbîy mîyan. Mesela, sey “do”, “finu”, “ewta” “gede”. Labelê çekuya “finu” herinda “sey (gibi)” de şaş ameyêne şuxulnayene. Vatêne “Keso finuy Garo…” Zafê cayan de edatê “do” zî bîlasebeb amebi şuxulnayene.

Metnê kayî destê mi de nîyo, qaso ke mi goşdarî kerd, ez wazena tayê çîyanê şaşan tîya nîşan bidî. Vatêne “ez do ro ser Gara” yanî, sey kirdaskî “ez dê li ser Gara”. Kirdkî de bi no qayde yew qalib çin o. Mesela, kirdaskî vanê “ser çavan” la kirdkî de nêvanê “ser çiman”, ney, vanê “çiman ser”. Bi no qayde, merdim vano “Ez do Garayî ser o…”

Açarnayoxê kayî Sebahedîn Gültekin ke bi naznameyê “Xoser Welat” tayê rojnameyan de nuseno, heme nuşteyanê xo de wina keno. Bi zor gramatîk û qaydeyanê kirdkî xeripneno, keno sey kirdaskî. Û bi no hawa yew ziwano viraşte şuxulneno. Mesela nameyê çend heywanan ke hetê tayê dezgeyan ra serê bîlbordanê Dîyarbekirî de bi kirdaskî û kirdkî nusîyabîy zî eserî nê embazî yê. Seba îbareyê “Nameyê Heywanan” ey “Nameyey Sewalan” nuştbi. Herinda “Na ema min a” yanî vera “Ev meta min e” yê kirdaskî de ey “Na naca min a” nuştbi. Kayê “Ti Gara Nîyî” de zî ziwan bi no qayde şuxulnayo.

Edatî şaş amebîy şuxulnayene. Mesela, herinda “Mi ra hêrs benê” de vatêne “Mi rê hêrs benê”. Edatê “di” ke kirdkî de bîyo vîndî la kirdaskî de esto, seraser amebi şuxulanayene: “Di şer de”, “di mîyan de…” Tirkî de vatişêkê teqdîrkerdişî esto vanê, “Varol”. Açarnayoxî no vate sey “Ti estbî” açarnabi. Tayê çekuyê bînî ke mi vîr de mendê: juyayîş (yanî, yaşam), serbaz (manaya subay de), pêk nêard, nakokî, ciwat, niştecih, di dim şewe de (gecenin sonunda), mi vîna (yanî, mi dî), zîyafetê şanî (yanî, zîyafetê şamî)…



Her hîrê kaykerdoxê kayê Ti Gara Nîyî

Murad Canşad

## Heweskarê Roja Hewrine

Nêserranê peyênan tayê bajaranê Tirkîya de kurdî rastê hêrîşan yenê, lînç benê, dikanê înan yenê talan kerdene û veşnayene, mal û milkê înan yeno wêran kerdene.

Kurdî nê bajaran de 25-30 serranê peyênan de ca bîyê. Welat de îdareyê xo nêbîyo yan dewê înan ameyê veng (tal) kerdene û veşnayene, zilm û zor bi înan ameyo kerdene… Mecbur mendê erdê xo teriknayo.

Wexto ke kurdî şîy bajaranê Tirkîya de ca bîy, hedîseyê ewroyinî nêvejîyay. Heyam sukit bi. Tayê fêlbazan no hal-hewal sîyasetê xo rê kerdênê malzeme. Vatêne, şima dî, kurdê ke dewê xo caverdanê nêşinê welatêkê bînî de ca nêbenê, ancî Tirkîya de manenê; çunke ma yew ê, kes nêeşkeno ma yewbînan ra cê bikero…

Kurdî feqîr bîy, tebayê xo çin bî; ne sereyî ser o ban ne sifreyî ser o nan. Cinî-camêrd, pîl-qij, çi kar ke kewt bi dest kerd. Karo tewr çetin para înan, emego tewr erjan yê înan… Xizmetkarîye, karê hêgayan, karê konfeksîyonî, karê çîtareyî… Karxaneyê ke tede heqê emegî panc quruşî nêkeno, bi kêna û lajanê kurdan bîy pirr, hîna zî pirr ê. Nê, şodir ra hetanî şewe 11-12 saetî gureyenê. Bi no hawa kurdan xo rê ban viraşt, bîy wayîrê dikanan.

Çitur viraşt, çitur bîy wayîr?

Werdene ra birna, şimitene ra birna. Kinca serê xo ra birna. Domanê êl-qewmî şinê mekteban, kîseyê may û pî ra kay û kelebute de yê; domanê kurdan atolye û karxaneyan ra sereyê xo nêvejenê teber. Yê êl-qewmî tatîl o, keyf û seyran o; yê kurdan serre hîrê sey û şeştî û şeş rojî kar o, gure yo.

Sedemê nê hedîseyanê çend serranê peyênan çi yo? Qey kurdî lînc benê, qey mal û milkê înan talan û wêran beno? Rast a ke rîyê cengî ra yo, rast a rîyê cenazeyan ra yo? Êyê ke na barbarîye kenê, ceng û cenazeyî zaf eynê înan de yê, zaf înan eleqedar kenê? Ney! Qet eleqeyê xo pê çin o!

Serra 2000î ra pey ez çend serrî Bursa de menda. Yê mi hepisxane bo zî hawa û qal-qirê bajarî ameyêne restêne peyê beran. Gardîyanî, mehkumê edlî, çapemenîya bajarî…

Çend xortan qise fekê yewbînan ra remnayêne:

“Wina nêbeno keko wina nêbeno! Pêroyê bajarî kurdan girewto xo dest. No 200-250 serrî yo ma nê bajarî de yê. Yê ma banêko yewqat. Dîyarbekirij yeno kîşta banê ma de virazeno aparmanêko desqat, otêle pancêsqat. Banê ma leye de sey bereqa maneno. Mêrik her çî keno; qumarbazîye, fuhûş, esrareroîn… Heme pereyê bajarî kîsikê ey de kom benê…”

Nê xortî cenazeyan ra qet nêdejayêne. Pê keyfê xo ameyêne! Vatêne, eke cenazeyî zaf bêrê, dewlete nê cengî qedênena û efû vejena, ma zî kewenê efû ver. Omîdê înan cenazeyî bîy!

Ya, mesele ne can o ne cendeg o. Û mesele ne Tikîya ya ne zî yewpareyîya Tirkîya ya… Ewro bajaranê tirkan de xeylê kesan çim verdayo bi mal û milkê kurdan. Verê cû, rûm, armenî û cihûdî estbîy. Her çî înan dest ra ame girewtene. Eke hendayê înan wayîrê mal û milkî nêbê zî, nika kurdî estê. Tayê ecêb dorê lewanê xo lêsenê, pabeyê roja hewrine yê!

Cengo ke hîris serrî yo dewam keno, beno ke meşte-bîro biqedîyo. La na çimsûrîya ke vera kurdan de bena, nêqedêna.

# Mabedê Nuh Pêxamberî ya koyê Cudî de ame bombe kerdene

Mabedê Nuh Pêxamberî ke koyê Cudî ser o bi seyan serrî verê cû virazîyayo hetê helîkopteranê artêşa tirkan ra ame bombarduman kerdene.

Goreyê ke ajansa Feratî îdîa kena, mabedê Nuh Pêxamberî û dodrûverê ey hetê helîkopteranê ke Tabûrê Madenî ya Şirnexî weriştê ra nêm saete ameyê bombarduman kerdene. Badê helîkopteran, na rey tabure ra bi eştişê topan mintiqa ameya bobarduman kerdene.

Mabedê Nuh Pêxamberî serê koyê Cudî de nuqtayêka 2089 berze de bi seyan serrî verê cû ameyo awan kerdene. Mabedê Nuh Pêxamberî hetanî serra 1984 ke hîna pêrodayîşanê mîyanê dewleta tirkan û çekdaranê PKK de dest pênêkerdbi, şarê mintiqa her serre roja hewtê temmuze ameyêne zîyaret kerdene. La rîyê pêrodayîşan ra nê 25 serrî yê ke koyê Cudî şarê sivîlî rê qedexe yo û hertim beno warê şer û pêrodayîşan. Çiqas dew û şêngehê ke dorûverê koyê Cudî de bîy, heme amey veşnayene û wêran bîy.



Mabedê Nebî Nuhî

# Radyoyê Înternetî yê kurdan dest bi weşane kerd

Radyoyê KurdFm ke înternetî ser o weşane keno, sey APPê yewin yê Înternetî yê kurdan dest bi weşane kerd.

Radyoyê KurdFmî badê ke gelek wext weşana testî kerde, nika goreyê teknîkê averşîyayeyî ra seba şuxulnayoxanê Iphone (APP Applikation) ke telefonê destan ra goşdarî beno, dest bi weşane kerd.

Radyoyê KurdFmî bi na taybetîya xo sey APPê yewin yê kurdan mîyanê programanê Iphonî de ca girewt. Hetanî nika cîhan de 9500 kesan Iphon ronayo. Mîyanê welatanê ke Iphon ronayê de Almanya û Tirkîya tewr sere de yê.

Radyoyê KurdFm ke studyoyê ey Almanya de yo, xo amade keno ke hetanî peynîya na serre dest bi weşana zindîye bikero. Radyoyê KurdFm ke do 24 saetî weşana zindî bikero, şewa serrnewa de bi organîzekerdişê konserêk do weşana xo ya zindîye îlan bikero.

Radyoyê KurdFm xebata xo ya ke Almanya de bibo marka dewam keno û lebitîyêno ke Tirkîya de zî bibo marka.

Weşana zindî ya Radyoyê KurdFmî www.KurdFm.com ser o bi ronayîşê Windows Media Player, Winanp, Flash Player û Real Player zî yena goşdarî kerdene.

www.arsivakurd.org

## *Taxût**

**Goran Mihemed**

Ger konsolê giştî yê Îranê li Hewlêrê di meseleya hilbijartina hunermendên Îranî û organîzekirina konserên li vir de, xwedî biryar be, ev mîna wê yekê ye ku Usameyê Kurê Laden bibe şêwirmendê yekem ê Amnesty International. Ji xwe eger em bixwazin ji niha û şûn de bi awayekî eşkere xelkê li Park a Samî Ebdulrehman bi tadano darvebikin, wê demê normale em şêwiriyê bi konsolê giştî yê Îranê li Hewlêrê bikin, ji ber ku ew di wî warî de bi rengê sor destrengîn in. An eger em bixwazin baştirîn corên darên lêxistinê di xwepêşandanan de bikar bînin, cihê herî baş Îran e. Herwiha ger em bixwazin fêrî baştirîn û bibandortirîn awayên şikandina rûmeta mirov û biçûkirina wan bibin, kî ji Komara Îslamî ya Îranê baştire ku em kursên fêrbûnê lê bibînin?

Kekê konsol hatina Guguş (hunermendeke navdar a Farse) ji bo Hewlêrê, weke karekî xerab li ser têkiliyên herdu aliyan dibîne, lê gava welatê wî tenê ji bo 'henek' ji sibehê heta êvarê topan bi pişta meve ne, ev tê wateya bihêzkirina dostaniya me, ji ber ku pêvenan her dinavbera dostan de heye. Gelo ku zeravê konsulê giştî yê Îranê û hikûmeta wî ji Guguş û Ajansa Enerjiya Etomê biqete, ma guneha me çiye?

Îran hemû dinyayê weke pismamê Şeytan binav dike, ji ber ku wek Konseya Ewlekariya Îranê dibêje ew hemû welatê wan dorpêç dikin. Manê Îran a ku dorpêçê deyne ser hunermendan û rê li ber xelkê welatê xwe bigre û nehêle ew guhdariya 3 stranan bikin, welatek ku rewşa wî weha be û xwediya enerjiya etomê be, her başe ku civaka navnetewî tenê wan dorpêç dike û rojane şêstûşest caran bombebaran nake.

Cudahiya di navbera me û Komara Îslamî de ewe ku em derewan nakin û ew jî rast nabêjin. Li Îranê kesên wiha hene ku bêhiş diçin nimêjê, ji ber maddeyên hoşker gelek zêdene! Qet nebe li cem me navnîşanên mizgeft û meyxaneyan diyar in û kesê diçe ciyekî naçe yê din. Helbet lojîka ku her kes diçe gora xwe, tê wateya ku her kes azade, lê diyare li Îranê hemû diçin gorekê.

Belgeyên dotaniya Îranê bo me zêdene û hêjayê konsul jibîr kir behsa wan bike, ji Îranê gelek corên maddeyên bêhoşker ji me re tên, ev jî ji bo wê yekê ye ku xeyala me wek a wan xweş be û em ewqasî gêj bin dema li Ehmedînejad temaşe bikin, Guevara bê pêş çavên me. Îran berdewam topan li me dixe, ji bo ku herdem ew rastiye li bîra me be ku em çiqas bê heval in.

Cenabê konsul dibêje: "ev stran ji bo me herdu aliyan xerab in." Lê zererên wan ron nekirine! Ez tiştekî nabêjim, hûn û wîjdana xwe, deh xulekan berê xwe bidin hin gutarên Îranê û 3 xulekan jî guhdariya Guguşê bikin, pişt re hûn bi xwe biryarê bidin.

* *Peyva 'Taxût' tê wateya kafir. Di hevpeyvînekê ligel Rûdawê de Konsolê Giştî yê Îranê li Hewlêrê gotibû ku ew naxwazin Hikûmeta Kurdistanê konseran ji bo stranbêjên Taxût saz bike. Mebesta wî stranbêjên Fars bû ku ji Komara Îslamî reviyane û li derve dijîn.*

# *Madeya 140: Dema behskirina hûrdekariyên wê hatiye*

**David Romano**



Hê jî pêkanîna madeya 140 a Yasaya Îraqê, ji bo pêkanîna hevpeymaniyê digel her aliyeke Îraqî bo avakirina Hikûmetek hevpeymanî ya nû, weke giringtirîn daxwaz û şertên Kurdan tê nasîn. Madeya 140 rêya asayîkirina rewşa Kerkûkê vedike û herêmên cihê nakokiyê (nemaze vegeriyana xelkên koçber ji bo ser warên wan ên ku rejîma Baas ew jê derxistibûn), herwiha rê xweş dike ji bo encamdana serjimêrî û referandûmê bo xelkê van herêman; ev referendum wê nerîna rûniştwanên herêmê diyar bike ka ew dixwazin bi Herêma Kurdistanê re bin yan ne.

Tê gotin ku Nûrî Malikî û serokên din ên Şîi, soz dane Kurdan ku ew ne tenê li ser sazkirina serjimêriyê, lê ji bo encamdana referandumê di demek diyarîkirî de razî ne. Ev soz li hember razîbûna Kurdan ji bo pêkanîna Hikûmeta nû ya Îraqê hatiye dayîn. Ev jî di demekê de ye ku aliyên hêzdar ên nava lîsteya El-Îraqiye bi tundî dijî cîbicîkirina madeya 140 sekinîne.

Pirsa ku ji aliyê ti kesî nahê behskirin, hûrdekariyên encamadayîna referandûmê ne, dibe sedema wê yekê nebûna armanca Partiyên Ereb ên Bexda derbarê pêkanîna referandûmê be, lê Partiyên Kurd jî ev pirs nexistine ber lêkolîn û nîqaşkirinê. Ji bo mînak ger encama referandûmê 50+1 (erê) be, ew dever wê bikeve ser Herêma Kurdistanê? Ger wisa ye gelo hemû bajarên ser bi Parêzgehan dibin Kurdistan?

Pirsên han, aloziyên cidî tînin holê. Nîqaşkirin li ser pirsên han dibe ku metirsiya çêbûna şer pêk bîne. Referandûm lewra ji bo ku beşeke rûniştvanên navçeyên cihê nakokiyê tê encamdayîn, nemaze herêmên Kurdan, bi awayek demokratîk beşeke girîng a dahatûya xwe ya siyasî diyarî bikin. Berjewendiya ti kesî nîne (ji bilî cîhadiyan ku ji aramiyê li Îraqê hez nakin), ku hejmarek zêde ji xelkê bi zor bên neçarkirin berewajiyê heza xwe bibin beşek ji Kurdistan. Kurd li hemû haleteke diviya baş bizanin ku neçarkirina xelkê ji bo hatin bo nav sîstemeke siyasî ya cuda de, tê çi wateyê. Girêdayîna bajarokên wek Hewîce û Telefer bi Kurdistanê, bêhna alozî û pirsan jê tê.

Bêguman pêwîst e beriya referandûmê ji bo kêmkirina pirsên han çend pêkhat bên diyarîkirin, niha jî derfetek baş e ji bo Kurdan. Gotûbêjkirin li ser egera encaman beriya rêveçûna referandûmê, belkî bibe cihê nemana gumanê ji bo ew grûpên ku naxwazin bibin beşek ji Kurdistanê. Ji bo mînak ger bajarokek dengê "ne" bide referandûmê, nakeve ser Kurdistanê, ji aliyek din jî ger encama giştî ya Parêzgehê "belê" be, dîsa jî bajarokên wek Hewîce û Telefer ji vê pirsê dûr dimînin.

Sala 2008'an Rêxistina UNAMI pêşniyarek kir, lê wê pêşniyaz wek lihevhatineke mezin bi nav kiribû, lê ne referandûm. Wê demê serokên siyasî li gor serjimêrî, nifûsnasî û lêkolînkirina li ser pêkhata eşîrî, nexşeya parêzgehan dikişînin û bi vî awayî girêdayîna bi zor ên herêman bi Kurdistan û Bexdayê ve kêm dibe. Îmzakirina lihevhatinnameyekê beriya encamdayîna referandûmê derbarê hûrdekariyan, digel razîbûn bo çend encamên referandûmê, rengê xwediyê heman destkeft be ku madeya 140 a yasayê dimeşîne.

Aliyên aloz ên lihevhatinameyeke han, sê pirsên aloz bi xwe ve digire.

Yekem: Destkarînekirina navçeyan, (wate "girava Telefer" nehê çêkirin ku derdora wê hemû Herêma Kurdistanê be yan "girava Kurd" li başûrê Diyale).

Duyem: Avakirina parêzgeha biçûk ku ji (bajarok, nahiye, kolan û...) pêkhatibe, bi vî awayî jî dengê piranî çarenivîsa herêmê diyarî dike.

Sêyem: Rêgirtina li perçebûna bajaran, nemaze Kerkûkê. Dibe ku ev ne astengeke zehmet be, lê dibe ku rêgirtina li perçebûna bajaran pirsgirêkên mezin jê dirust bibe. (Tenê ji rûniştvanên bajarên Orşelîm û Serayvo bipirs e).

Wate dikare rêjeya zêde ya "belê" ji bo girêdana bi Kurdistanê ve bê danîn, ji bo mînak eger li cihekî bêtirî ji sedî 70 dengê "belê" dan, wê demê divê ew dever bikeve ser Kurdistanê, herwiha dikare "nasnameyeke taybetî" jî ji wê navçeyê re bê dayîn ku rêjeya referandûmê tê de di navbera ji sedî 30 heta 70 be. (ango eger ji sedî 30 xelkê Kerkûkê di referandûmê de dengê 'erê' dan ji bo girêdana Kurkûkê bi Herêma Kurdistanê ve, wê demê nasnameya wê wek xwe dimîne, lê eger ji sedî 70 xelkê Kerkûkê dengê "erê" dan ji bo girêdana Kerkûkê bi Herêma Kurdistanê ve, divê Kerkûk bikeve ser Kurdistanê. Ji bilî wan du encaman jî, eger encamek din derket diviya "nasnameyek taybetî" bidin wê)

Pêwîst e Serokatiya Herêma Kurdistanê pêşniyaz bike yan bi awayek hevbeş digel hevpeymanên Bexda, hemû serok û aliyên siyasî yên herêmên ku nakokî li ser heye, bicive û li ser pirsên han biaxivin.

# *Ji bo Tirkiyê Yekîtiya axa Îraqê giringtir e ji petrola Kurdistanê*

**Wladimir Van Welgenburg**



Pisporê Karûbarên Îraqê, Joost Hilterman, bawer dike ku hêjî ji bo Tirkiyê parastina yekîtiya axa Îraqê ji petrol û gaza Kurdistanê giringtir e. Wate herçend metirsiya Partiya Îslamî ya Desthilatdar li Tirkiyê bo ser Kurdên Îraqê kêmtir e, lê tirs ji nasyonalîzma Kurdan kêm nebûye.

Li gor gotina Hilterman, li Îraqê sê xal ji bo Tirkiyê pir giring in; Yekem: Yekîtiya axa Îraqê, duyem: Kêmkirina bandora Îranê, sêyem: Kirîna rêjeyek zêde ji petrol û gazê.

Heftiya borî Nêçîrvan Barzanî serdana Tirkiyê kir, berî wî jî wezîr û kardbidestên Tirkiyê hatibûn Kurdistanê. Ev nîşaneya başbûna pêwendiyên herdu aliyan derdixe, lê ev jî eşkere ye ku niha jî Tirkiye ji hêzdarbûna Kurdên Îraqê ditirse, lewra herçend Tirkiye dixwaze digel Kurdan bibe xwediyê têkiliyên baş, lê jê re giring e hêza Kurd herdem sînordar bimîne û ti car herêmên cihê nakokiyê nekevin dest Kurdan.

Tirkiye armancên xwe jî bi şêwazên curbidur encam dide, ji bo mînak li Parêzgeha Musil piştevaniya grûpên Ereb ên wek grûpa Hedba ya neteweperest dike li dijî Kurdên parêzgeha Neynewa. Herwiha dema hilbijartinê jî, piştevaniya lîsteya EL-Îraqiye ya Eyad Elawî û wan alî û partiyan kir ku li Kerkûkê li dijî cîbicîkirina madeya 140 û berfirehkirina çaroveya desthilata Kurdan disekinin. Li Ewrûpa û Amerîka jî piştgiriya aborî pêşkeşî wan partiyên Turkmanî dikin ku li dijî Herêma Kurdistanê ne. Serbarê vê yekê jî Tirkiye balyozxane li Kurdistanê avakiriye û asta peywendiyên xwe yên bazirganî jî zêde kiriye.

Ev jî yek ji armancên aramragirtina Başûrê Rojavaya Tirkiyê û baştirkirina rewşa aboriya vê herêmê ye, ji ber ku eger li wir rewşa aborî nebaş be, astê piştevanîkirin ji Partiya Karkerên Kurdistanê PKK'ê zêdetir dibe û eva jî nearamiyê li pey xwe tîne. Herwiha rewşa aboriya Herêmên Kurdan ên Tirkiyê bi tewahî girêdayî aboriya Herêma Kurdistanê û beşên din ên Îraqê ye.

Dîsan nûkirina peymannameya hevkariya navbera Tirkiye û Îraqê li ser hêla petrola Kerkûk-Ceyhanê di meha Îlon de vê rastiyê rontir dike ku ji bo Tirkiyê yekîtiya axa Îraqê ji petrol û gaza Kurdistanê giringtir e, ji ber ku li vir Tirkiye Bexda hilbijart û eşkere kir tenê îtraf bi serweriya siyaseta petrola Hikûmeta Federal dike. Herwiha di peymannameyê de behsa hevkariya di navbera Îraq û Tirkiyê di warê berhemanîna gazê de hatiye kirin, tevî ku îmkanên Bexda ji bo derxistina gazê nînin, lê Kurdistanê ew îmkan heye!

Bexda heta niha jî nekariye elekterîkê ji bo welatiyên xwe bi tewahî dabîn bike, lê Kurdistanê ji rêya gaza xwe rêjeyek zêde elektirîk dabîn kiriye.

Îmzekirina peymannamê diyar dike ku Tirkiye dixwaze bi pêkanîna guşarên ser Kurdan, wan neçar bike ku ligel Bexda pêk bê, ji ber ku hebûna pirsên navbera Kurdistan û Bexda rê li derçûna yasaya petrol û gazê girtiye û ev jî bûye cihê nîgeraniya Tirkiyê. Kurdên Îraqê bêyî hevkariya Tirkiyê nikarin petrol û gaza xwe bişînin derve, tevî ku Kurd pir hez dikin vî karî encam bidin ji bo ku perê zêdetir bidet bixin û aboriya xwe bihêz bikin. Ji bo Îranê Kurd tenê dikarin bi qaçax petrolê bişînin, ev jî hem dahatek kêm heye û hem jî serêşiyê ji bo Amerîka çê dike, lewra Tirkiye dixwaze di rewşeke weha de Kurdan bixe bin guşaran ji bo ku serweriya siyaseta petrola Îraqê li ser xwe bipejirîne.

Pirsa mezin ji bo Tirkiyê ev e ku hê hikûmeta nû ya Îraqê pêk nehatiye û Tirkiye jî dixwaze hikûmetek pê bê ku aliyên Sunnî tê de desthilatdar bin, ne Şîie ku zêdetir nêzîkê Îranê ne.

Ger hikûmet pêk bê, Tirkiye dixwaze rola navbijîvaniyê di nava Kurd û Bexda de bilîze ji bo çareserkirina pirsên netewî. Digle vê jî çavê Tirkiyê li petrol û gaza Kurdistanê ye, lê Tirkiye wê demê petrol û gaza Kurdidtanê dixwaze ku Bexda bide wê, ne Hewlêr! Armanc jî girêdayîna Kurdan e bi Bexda ve jî bo ku hizra serxwebûnê nekin, ji ber ku hê jî Tirkiye ji berfirehbûna desthilata Kurdan li Îraqê ditirs e.

www.arsivakurd.org



# Dementieva dev ji tenîsê berda

Tenîsvana Rûs a 29 salî Elena Dementieva di şampiyoniya jinan WTA ya li Katarê de dev ji tenîsê berda. Dementieva di sala 1988'an de dest bi tenîsê kiribû û di 16 tûrnovayan de şampiyonî bidest xistibû û di Olîmipiyata Pekînê a 2008'an de jî madalyaya zêr wergirtibû.

Elena Dementieva di 15'ê Cotmeh a 1981'an de li Moskovayê hatibû dinyayê, ji sala 1988'an û şûn de tenîsê dilîst. Navê Dementievayê ji sala 1988'an û şûn de hertim di nava 20 lîstikvanên herî baş ên jin de derbas dibû. Dementieva hefta borî li şampiyoniya Katarê di lîstika li himberê Francesca Schiavone ya Îtalî de maçê 2-0 winda kir û daxuyand, "Ez ji her kesî re ku piştgiriya min dikirin, spas dikim. Ez niha di nava gelek hestên germ de me. Zehmet e ku ez bêjim bi xatirê we."

Dementieva ragihand ku wê ji destpêka sezonê de fikiriye ku dev ji tenîsê berde, jiber ku ew êdî 29 salî ye û dixwaze di jiyana xwe de hîn guhertinan bike.

Dementieva di sala 2004'an de bûbû şampiyona French Open û di heman salê de bûbû şampiyona US Open û di sala 2008'an de jî bûbû şampiyona Olîmpiyatên Pekînê û madalyaya zêr wergirtibû. Dementieva ji sala 2003'an pê ve di rêza 20 lîstikvanên herî baş de cîh digirt, careke bû 3. lîstikvana jin û di hemû turnovayan de bi giştî 14 milyomn Dolar pere bidest xist.

Piştî Olîmpiyata Pekînê Dementieva gelek caran birîndar bûbû û bi nexweşiyên xwe re mijûl bû.



# Çinar Wirya diçe Çînê

Lîstikvana Tîma Setrenc a Pêşmergeyên Silêmaniyê û Tîma Îraqê, Çinar Wirya, wê biçe Çînê û beşdarî du lîgên Asyayê bibe.

**Silêmanî (Rûdaw) -** Lîstikvana Kurd, Çinar Wirya Qanîi, ku li ser asta welatên Ereb û Asyayê xwediya çendîn medalyayên zêr û zêv e, di dema borî de beşdarî çend olîmpiyatên navnetewî bûye û kariye asteke bilind nîşan bide. Navborî derbarê astê lîstika setrencê li Kurdistanê daxuyaniyek da Rûdawê û got, "Ez dibînim ku setrenca Kurdistanê di asteke baş de ye, lê ne li gor pêwîstiyê ye, ji ber ku li vir bêtir girîngî bi lîstika fûtbolê tê dayîn, lê ne bi setrencê."

Çinar berî çend rojan ji bo beşdarbûna lîgeke setrencê berê xwe daye Çînê û paşê jî wê ji bo heman mebestê biçe Urdinê. Çinar derbarê beşdarbûna xwe ya wan herdu lîgan de got, "Ez dixwazim li ser asta Îraqê bêtirîn medalyeyan bidest bixim." Ew hêvîdar e ku li Kurdistanê fêrgeheke taybet ji bo lîstina setrencê bê avakirin û ji bo wê lîstikê rahênerên biyanî yên pispor bên garantî kirin.

# Kolêja Sporê jinên ducanî naxwaze

**Silêmanê (Rûdaw) -** Rêvebirê Kolêja Perwedeya Werzişî li Zanîngeha Silêmaniyê dibêje keçên ku werin kolêja me û ducanî bin, divê destûrê bistînin û biçin mala xwe, ji ber ku em nikarin wan bixin dersên pratîkê.

Rêvebirê Kolêja Perwerdeya Werzişî li Zanîngeha Silêmaniyê, Dr. Elî Qadir, ji bo Rûdawê got "Nêzîkî ji sedî 70'ê dersên kolêja me pratîkî ne û tê de gelek tevger û bez tê hene, vêca ji bo ku jinên ducan ên ku li vir dixwînin digel zarokê wan jî saxlem bimînin, em destûrê didin wan ku biçin malê û eger ew xwendekar qayil jî nebe, dîsa tê destûrdayîn." Dr. Elî herwiha got "Her keça ku li vir dixwend û ducanî dibû me nehêşt ew xwandina xwe berdewam bike û me ew şandiye malê."



Keçên du can ji bo tendirustiya xwe divê tevlî dersên pratîk nebin

Li gor axaftinên Rêvebirê Kolêja Perwerdeya Werzişî li Silêmaniyê, li ser asta Îraqê bêtirîn hejmara keçan li kolêjên Perwedeya Werzişî yên herdu zanîngehên Silêmanî û Selaheddîn a Hewlêrê dixwînin.

# Rêzetêkçûn didome

Diyarbakirspor ji Samsûnê jî bê pûan vegeriya.



**Amed (Rûdaw) -** Tîma Diyarbakirsporê di maça li hemberê Samsunsporê de jî biserneket û di tabellaya lîgê de di cihê xwe yê herî binî de ma. Pûanên Diyarbakirsporê hê jî 3 ye. Roja 31'ê Cotmehê di 10. lîstika sezonê de Diyarbakirspor bû mêvanê Samsunsporê. Tîma xwediyê malê bi lezgînî dest bi lîstikê kir û di 45 deqeyên pêşî de 3 gol avêtin qeleya Diyarbakirsporê. Di nîva duyem de forvetê Diyarbakirsporê Ali Cansun di deqeya 68.de gola tîma xwe ya yekem û ya dawî avêt û skora maçê 3-1 bi dawî bû.

### 7 meh in serkeftin tune

Diyarbakirspor ne tenê di di 10 maçên sezona 2010/2011'an de bisernakeve, lê ev 7 meh in ku qek serkeftin nedîtiye. Maça biserkeftî ya herî dawî Diyarbakirspor li himberê Antalyasporê di 27'ê Adar a 2010'an de li Antalya lîstibû û 1-0 biserketibû. Ji wê rojê pê de, Diyarbakirspor ti maç nestendiye.

DalKurd 6 lîstikvanên xwe diguherîne

# DalKurd kadroya xwe nû dike

**Dalarna (Rûdaw) -** Tîma DalKurd di çarçova amadekariya sezona 2011'an de dest bi guhertina kadroya xwe kir. Di vê çarçovê de wê Klûba DalKurdê heta 1'ê Kanûnê di şûna şeş lîstikvanên ku peymana wan bi dawî dibe, şeş lîstikvanên nû tevlî kadroya xwe bike. Serokê Klûbê Ramazan Kizil daxuyand ku ew ê sê lîstikvan ji bingeha klûba xwe û sê lîstikvanên din ên bi ezmûn jî ji klûbên din bistînin.

Sezona lîgên Swêdê yên jêr di 24'ê Cotmehê de bi dawî bû û sezona nû wê di 15'ê Gulan a 2011'an de dest pê bike. Klûb jî di vê navberê de ji bo amadekariya sezona nû lîstikvanên xwe nû dikin. Tîma Kurd DalKurd bi vê mabestê roja 30'ê Cotmehê 5 lîstikvanên nû di lîstikeke ceribandinê de temaşe kir û ji van yekî Afrîkî yê bi navê Ammar Ehmed eciband. Serokê Klûbê Ramazan Kizil daxuyand ku du klûbên ji Lîga Alsvenskanê jî li dû vî lîstikvanê ne. Kizil da zanîn ku ew roja şemiya borî bi lîstikvaneke din re jî hevdîtin çêkirine û dixwazin wî jî tevlî kadroya xwe bikin.

6 lîstikvanên DalKurdê peymana wan di 1'ê Kanûnê de bi dawî dibe û divê klûb heta wê demê, di şûna wan de 6 lîstikvanên nû bicîh bike.

www.arsivakurd.org



# Joanna eyarê xwe avêt

Top model û listîkvana sînemayê, Joanna Krupa, ji bo piştgiriya rêxistina ajalperest PETA ku çalakiyan di warê parastina mafên giyandarên “bê îrade“ de didomîne, kampanyeke xwetazîkirinê destpêkir. Joanna Krupa wêneyên xwe di gelek posteran de bi şêweyekî tam tazî belavkirine û li ser wan nivîsandiye “Baştir e ez tazî bim, lê ne heyarê ajelan li xwe bikim.“ Rêxistina PETA dibêje ku “ajel îşkenceyeke mezin dikşînin, ji ber ku eyarê wan bi saxî tê rakirin, ji bo ku eyarê wan xerab nebe.“ Krupa bangî hevalên xwe yên model û dizayner kir ku eyarê ajelan li xwe nekin: “Ez nizanim çawa hin dizayner dikarin eyarê ajelan li xwe bikin, tevî ku dizanin ew ajel bi saxî hatine jigirtin.”



# Dilşad Zaxoyî poşman e

Dilşad Zaxoyî sala 1994’an berhema xwe ya yekem bi navê ‘Dîlbera Min’ belav kir, niha heşt berhemên wî hene. Zaxoyî dixwaze hin stranên zarokan û sirûdên olî jî bibêje, ew dibêje ne pêwîst e stranbêj keçan di klîpên xwe de bikar bînin: "Ger stran wê nexwaze pêwîst nake, lê mixabin hin hunermend berê xelkê didin temaşekirina bejin û bala keçan."

Zaxoyî sala 1997’an hatiye derveyî welat: "Hatina min çavlêkirin bû û ez poşman im, xwezî nehatibama, lê ez ê her vegerim Kurdistanê." Ew dibêje "Li hin konserên li Ewrûpa dema kesekî ala Kurdistanê datanî ser milê min, çavên min tije hêsir dibûn."




# Ciwanên Kurd ‘Cejna Komarê’ pîroz kirin

**ANF -** 29’ê Cotmehê ku li Tirkiyê ev 86 sal in wek Cejna Avakirina Komarê tê pîrozkirin, bêtir li herêmên Kurdan dibe xwepêşandana hêzên dewletê. Ciwanên Kurd bi helwesta “pîrozkirina” cejna 29’ê Cotmehê, di Facebookê de çalakiyeke sîber pêkanîn. Hackerên Kurd di Facebookê de gelek malperên nijadperest ên Tirk hack kirin.

Grûpa hacker a Kurd ku xwe wek “Tevgera Azadiya Kurd” binav dikin, tola malperên Kurd ên ku meha borî ji aliyê hackerên Tirk ve hatibûn têkdan, standin û gelek malperên ku di Facebookê de propagandaya nijadperestiya Tirk û dijminatiya Kurd dikirin, kirin bin destên xwe.

Çend malperên ku hatine hacker kirin ev in: “İzmirli Ulkuculer”, “Manisali Ulkuculer”, “İstanbullu Ulkuculer”, “Ankarali Ulkuculer”.

# Kovara mêran, jinên xweşik diyar kirin

Kovara mêran a ku navenda wê li Amerîka yê û li 17 welatan tê weşandin, Esquire jinên herî xweşik ên sala 2010’an diyar kir. Versiyona kovarê Esquire Îspanya, bi gelek wêneyan “Atlasa Jinên Zindî yên Seksî 2010” belav kir. Di nava van 195 jinên bijartî de gelek top model, aktrîs, stranbêj, siyasetmedar, spîkerên televizyonê û hevjînên siyasetmadaran ên ku bi navê First Lady tên naskirin, hene. Li gor kovarê jina herî xweşik a Almanyayê Diane Kruger, ji Brezilyayê Gisele Bundchen, ji Îtalyayê Monic Bellucî ye.

Li gor Esquire Îspanya ji Arjantinê jina herî xweşîk Serokadewlet Cristina Fernandez e. Wekî din: Seroka Giştî ya Yekitiya Niştiman a Ukraine Yuliya Timoşenko, Hevjîna Serokê Fransa Carla Bruni û Hevjîna Kevneserokkomarê Azarbaycanê, Mihriban Aliyev; ji Afrîkaya Başûr aktrîs Charlize Theron, ji Tirkiyeyê moderatora televizyonê Burcu Esmersoy e.



## Xaçepirs

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 | 10 | 11 | 12 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | | | | | | | ■ | | | | |
| 2 | | | | | ■ | | ■ | | | ■ | | |
| 3 | | | | | | ■ | | | ■ | | | |
| 4 | | | | | ■ | | | | | | | ■ |
| 5 | | ■ | | ■ | | | | | | | ■ | |
| 6 | | | ■ | | | | | ■ | | | | |
| 7 | | | | | | | | | | | | ■ |
| 8 | ■ | | | | ■ | | | | | ■ | | |
| 9 | | | | | | | | ■ | | | | |
| 10 | | | | | | | ■ | | | ■ | | |

**Çeperast:** 1- Welatekî Ewrûpayê – Rengek. 2- Şev, piştî nîvro – Amnesty Întern atîonal – Bide min, bîne, êmê heywanan. 3- Darek (berepaş) – De haydê, yalla, rabe (berepaş) – Heywanek. 4- Horî, melayîket (berepaş) – Hacetek agirpêxistinê (berepaş). 5- Generalê deryayê. 6- Agir, namûs – Kesên ku berê mîr û paşa perwerde dikirin (berepaş) – Pereyên Ispanya û Arjantînê. 7- Netewperest, netewîst. 8- Pîvanek dirêjîyê, bi taybet ji bo deryayê tê bikaranîn – Bi Ingilîzî “şêr” – Deng, awaz. 9- Navekî zilaman – Gotin û dijûnên kolanan (berepaş). 10- Fêkîyek xweş – Unîted Kîngdom – Navnîşana malperên înternetê.

**Serejêr:** 1- Jinên ku şîr didoşin – Bide min, bîne. 2- Şirove, nirxandin, analîz (berepaş) – Fikir, hişmendî, îdeolojî. 3- Navekî keç û jinan (berepaş) – Li Misrê çiyayek 2285 metro bilind. 4- Por, gijole, mûyê heywanan (berepaş) – Navekî jinan. 5- Gotina telefonê – Gotinek ecêbmayînê. 6- Ne tûj, nabirre – Nameya salê, teqwîm (berepaş). 7- Rastî, berbiçavî (berepaş). 8- Meha Newrozê – Bangkirina zilaman, navtêdan. 9- Pirsek, pirsa di derbarê zilaman de – Kesê ku xelkê dixapîne. 10- Hacetek hilgirtinê, firax û xwarin dikevê (berepaş). 11- Şanoka kurt, kurteşano – Derzîyên dar û devîyan, darikên sertûj. 12- Qezenc, fayde – Notayek – Şêweyekî muzîkê.

### Bersivên hejmara 68

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 | 10 | 11 | 12 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | m | e | l | a | y | ê | c | i | z | î | r | î |
| 2 | e | f | a | r | e | ■ | î | r | û | r | a | z |
| 3 | y | û | n | a | n | î | ■ | s | ■ | o | ■ | m |
| 4 | r | ■ | e | r | ■ | n | a | ■ | d | ■ | m | e |
| 5 | e | z | m | a | n | î | ■ | d | a | p | î | r |
| 6 | m | a | ■ | t | e | f | a | n | d | i | n | ■ |
| 7 | x | î | m | ■ | x | ■ | r | a | ■ | r | a | k |
| 8 | a | y | a | m | ■ | ê | d | ■ | a | p | ■ | s |
| 9 | n | a | s | a | n | d | i | n | ■ | a | l | a |
| 10 | t | î | r | ■ | î | l | a | m | r | e | b | ■ |

www.arsivakurd.org